

azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxwebûnê birûmettir
tîstek nîn e. (Ho Chi Minh)*

hejmar 6-7 nîsan-gulan 1979

KURDISTANA ÎRANÊ: ŞERÊ

Kurdên Îranê vê biharê demeke azadî û serbestîya ji zûve nedîtî dijîn. Ji rojên Komara Mahabadê bivir de li bajar û gundên Kurdistanana Îranê hê sirra azadîyê wilo bixweşî ne hatibû. Piştî bêdengîya 33 salan, bi hezaran, bi dehhezaran Kurd, xort, keç, kal, pîr, jin, zaro, bajarî, gundî, eşîr dikevin kuçe ûkolanan jibo azadîyên xwe, jibo mafên xwe yên mirovî, demokratîk û neteweyî, jibo xweserî (otonomî) ya Kurdistanê di meşin, têkoşîn dikin. Gelo îcar ewê Kurd bi serkevin, mafên (heqên) xwe yên neteweyî bi dest xin? Ev pirs îro li ser lêva hemî Kurdan e. Nûçegihanên Azadîyê çûn Kurdistanana Îranê. Em di vê hejmarê de çend agahdarîyên giştî didin bo xwendevanên xwe û hejmara 8 an emê seranser li ser Kurdistanana Îranê derînin.

“**N**e Şah, ne Xumeynî!”. Piştî şerê gurrê dijî zordestî û dîktatorîya Şah, Kurdên Îranê naxwazin îro serî bitewînin li ber meleyekî heştê salî ku di bin xêlîya dîn de doza “Yekîtiya xelkê misilmanê Îranê dike”, çav lê ye dengê xelkên ku ne Ecem in bifetisîne.

Xelkên Îranê, Kurd, Azerî, Ecem, Ereb, Balûc, di sîh salên dawîn de bêtirî 60 000 şehîd û gorî dan di şerê xwe ye dijî rejîma zorkara Şah de, jibo bigihên azadîya xwe wekî merivên serfiraz di serbestî, xweşî û bextewarî de bijîn. Di vî şerê dirêj û bêgîdî de para gelê

SERRECEM

* Tirkîye bi kuda diçe (II).....	r. 6
* Mirina Barzanî.....	r. 9
* Ji Dîroka Kurdistanê.....	r.12
* Kardûx û Welatê Kardûxan (3).....	r.14
* Rizgarîya Jinan.....	r.15
* Daxuyanîya Partîya Kommunist.....	r.16
* Bîgehên Destpêkîyên Felsefê.....	r.18
* Yên ku jibo me şerkirin.....	r.19
* Çarsalîya Komela Fransa-Kurdistan.....	r.20
* KOYÎ, helbestvanê welatparêz.....	r.22
* Newrûz, folklor.....	r.23
* Koma Stran û Dîlana Kurda.....	r.24
* Nameyên Xwendevanan.....	r.26
* Zman.....	r.28
* Deng û Alan.....	r.29
* Stran û Leylan.....	r.31

XWESERÎ Û DEMOKRASÎYÊ

Kurd giran e û kes nikare vê rastîya dîrokî (tarîxî) înkâr bike. Di salên 1922-1930 de serokê Kurd Simko bi mêrxasî serîhilanîbû li ber Rîza Şah. Di 1931-1932 an de Cafer Sultan tevî eşîrên xwe şerê Şah kiribû. Komara Mahabadê, şerê gelê Kurdê jibo azadîyê, rejîma Şah tenê bi arîkarîya Ingilîz û Emerîkanîya jibo demekî karîbû bişkêne. Bi sedan mîlîtanên PDK a Iranê û alîgirên Komarê hatin kuştin an zîndankirin, di salên 1947-1949 an de.

Di her keysê de gelê Kurd nîşan dide ew çiqas ji xanedana Şah, ji rejîma wî ya kevnepe rest û stemkar nefret dike. Di helbijartinên 1952 an de, nemî-nendeyê (temsîlkarê) PDK ê ji Mahabadê û navçeyên Kurdî di av 80 û 99% ên dangan (rayan) stendibû. Tahran dawîneyan (netîceyan) qebûl nekir û melayekî tayîn kir meb'ûsê Mahabadê. Gava ku çend meh bi şûn de Dr. Mosadeq xwast neftên Iranê ji talana şîrketa Anglo-Iranian Oil Company xelas ke, têxe destê dewletê, gelê Kurd di qada şerê siyasî de bû, bi xurtî piştgirî ya Dr. Mosadeq kir. Di referandûma 3 tebax 1953 an li ser kêmkirina karînen (selahîyetên) Şah, Kurd bi piranîyeke giran li dijî Şah deng dan. Li Mahabadê, ji 5000 dengdaran tenê du kes dengê (raya) xwe dabû Şah. Piştî ku diyar bû ku piranîya gelên Iranê li dijî Şah in û ev xulamok û cendirmê Anglo-Iranian nikare bi tenê li ser text bimîne, CIA roja 19.8.1953 darbeyekî hikûmetî kir, Dr. Mosadeq qeliband û Şahê ku ji tirsê revîyabû Romayê (Italya) paşda anî, bi darê zorê danî ser hikim. Bi hezaran pêşverû - di nav de gelek Kurd - hatin girtin, kuştin an mecbûrî terkewelatîyê bûn.

Lê şer li Kurdistanê dom dikir. Di destpêka 1956 an de Kurdên Cîwanroj, ku li navbeyna Kermanshah û tixûbê Kurdistanê Iraqê dimînin, li dijî zordestîya leşker û cendirmên Şah serî hiltînin. Şerê wan zû fireh û geş dibe. Bombavêj û tankên Şah gundên Kurdan dişewitînin. Zordestê Iraqê Nûrî Saîd di tanga xwe de leşkerên xwe dişîne ser Kurdên serhilatî. Dengê Kurdan îcar jî jibo demekî tê fetisandin. Sala 1959 an, liber şerê siyasî yê ku di nav Kurdan de rojbiroj xurttir dibe, rejîma Şah dest bi girtinên jibo çavtirsandinê dike. Bi sedan karker, gundî, dersdar mela, sê endamên Komîta Merkezî ya PDK a Iranê tên girtin.

Di zivistana 1967 an de, gundî û xortên welatparêzên Kurd dest bi şerê çekdarî kirin di navçeya Mahabad, Bane û Serdeşt de. Ev şer qasî 18 mehan dom kir. Kêmasîya îmkanan, ji derve tecrîtbûn, xurtahîya hêzên leşkerîyên Iranê vê serxwerabûna mêrxasî vemirandin. Serokên wê Mela Aware, Şerîfzade, Evdillah Mûnî di meydana şer de, tiving di dest de ketin.

Vê sala borî de, di her awayî de Kurdistan yek ji kelên xurtirên tevgera azadîxwaza gelên Iranê bû li dijî Şahê zorkar. Bi sedan keç û xortên Kurd xwe jibo azadîyê dane kuştin li Kermanshahê, li Sînnê, li mesên Tehranê.

Gelê Kurd ev çend salan şer ne kir ku jibo piştî qelibandîna dîktatorîyeke hov û xwîn-xwar bikeve bin nîrê zorkarîyeke dînî û jibo xatirê "Yekîtîya Nisilmanî" dev ji maf û azadîyên xwe berde. Jibo car din bi hin gotin û wa'dên xweş û

birîqok neyên xapandin, Kurd î-car bi tedbîr û hesab gavên xwe davêjin, naxwazin xeletîyên berê cardin bikin.

Li hemberî hikûmeta merkezî temînata mezin xurtahîya siyasî û leşkerîya Kurda ye. Îro, derveyî çend bajarên (Kermanshah, Urmîyeh, Naxade, Şapûr, Mîyan duab) tevayîya gund û bajarên Kurdistanê di destên komîteyên şoreşgerî yên Kurdî de ne. Ev komîte, pîrîcar helbijartî,

her du enîyên yekîtiyê

Lê em naxwazin ku şer bike ve ser zemîna çekdarî, dibêje Dr. Abdulrahman Qasimlû, sekrete rê giştî yê Partîya Demokratî ya Kurdistana Iranê. Em ji 33 salên dîktatorîyê dertên; şûûr û zanîna siyasîya xelkê me hê qels in, di nav rêzên xelkê de hê perçebûn hene. Ku şerê çekdarî derkeve ewê ev perçebûn hê kûrtir û mestir bibin û Tahran di milekî de li ser wan bileyîze, hin eşîran di bin xêlîya dîn de li hemberî azadîxwazên Kurd rake û di milê din de bi milyonan şîfîyên Iranê bi şîarên dînî biarîne, tehrîk bike û bişîne cîhada dijî "Kurdên minafiq û Kommunist". Şerê awaha ne wekî şerê dijî leşkerê Şah e, dibe şerê dînî û jiber nezannî û taasûba bi milyonan gundîyên şîî dikare bibe sedemê qir kirinên mezin. Îroroj, divê ku şerê siyasî û îdeolojîk bê kirin; divê ku em xelkê xwe hişyartir kin, ji tesîra hin mela û kevneperestên bi Tahranê ve girêdayî xelas kin; yekîti û tenzîm û teşkîlata wî xurt bikin".

Şerê yekîtiyê îro li ser du enîyan tê ajotin. Berî hemî tiştan jibo serfirazîya doza xweserîyê (otonomîyê), divê ku di gîtê (safha) niha de hemî çîn û tebeqeyên xelkê li ser çend bingehên hîmî li dora partî û hêzên demokratîkên Kurd bên civandin, "enîya hindur" xurt be, keysê nede leyistikên hikûmeta merkezî.

Xurtahîya siyasî ya mestir li Kurdistanê, PDK a Iranê ye

berpîrsîyarê meşandina jiyana siyasî, aborî û îdarî ya navçeya (mîntîqa) xwe ne. Di bajarên ku di dest Kurda de ne cendîrme û polîsê Iranî ji binî ne mane û ku leşker li hin ciyan mabin jî ev hebûneke sembolîk e. Li ciyên din qîşle û qereqol ketine destên pêşmergeyên Kurd. Li bajarên çek û sîlihên her rengî bi serbestî tê firotin û gelek Kurd çekdar in; qasî sîh hezarî pêşmerge hene.

ku him bi kirinên xwe yên dewra Komara Mahabadê him bi şerkarîya xwe ya 33 salên dawîn xwe bi birrekî mezinê gelê Kurd daye hizkirin û qebûlkirinê. Li derveyî wê, xasme di nav xwendekarên bajarên de çend grûbên pêşverû hene ku ew milên hevdesazîyên (teşkîlatên) Iranî ne (Fedayîni Xelk, Zehmetkêş, hwd.). Birrekî berbiçavê xelkê, yên ku li gundên piçûkên çiyên de dimînin an di jiyaneke eşîrî de ne her çiqas dilxwazên doza kurdîtiyê bin jî bi tu hêzekî siyasî ve girêdayî nîn in. Jibo civandina wan di hoyên (şertên) îroyî de serokê dînî yê Mahabadê Şêx Ezedîn Huseynî bikêr tê. Şîara "Şêx Huseynî serwer e, bo Kurdistan rehber e!" pîranîya gundîyan dîghîne hev û dixê nav şerê siyasî.

Şêx Huseynî, li ber şêx û me layên Kurdistanê û yên Iranê, kesekî xwendî ye, haya wî ji guhêrandin û pîrsên cîhanê heye.

Partî û hemî hêzên Kurdistanê bi divîyahîya (zarûreta) yekîtiya hindur bawer in û heta niha aqûbeta wan baş bûye, di nav wan de pevçûn çê nebûne. Ew li hemberî dijminê mîsterek, bi hev re dimeşin. Demekî Kurdên Iraqê xwastin tîlîya xwe têxin nav karên Kurdistana Iranê lê zû pêşî li wan hate girtin. Şêx Huseynî jî Dr. Qasimlû jî bi wan dane zanîn ku ciyê şer û xebata wan Iraq e, ne Iran e.

Enîya din a yekîtiyê, ya hevalbendîya xebatê ya hemî hêz

KUŞTINA ELÎ ESKERÎ

Di hezîrana 1978 a, di navbeyna hêzên "Qiyada Miweqet" û yên Yekîtiya Niştîmanî şerekî mêrkuj qewimî bû. Di vî şerî de Elî Eskerî û Dr. Xalid, ji serokatîya Yekîtiya Niştîmanî, tevî hin pêşmergeyên xwe dîl ketî - bûn destên eşîrên "Qiyadê"

Nûçeyên dawîn ên ku ji kanîyên t êkûz gihîştine me eşkere dikin ku "Serok Îdrîs Barzanî" û Sekreterê Giştî Samî, "marksîst-lenînîst" ên ku heta duh berdevk û leyistokên SAVAK, Şah û CIA yê bûn û îro jî hê bi loq û parsa CIA û Israîl di jîn, Elî Eskerî, Dr. Xalid û çend hevalên wan dane kuştin.

Elî Eskerî ne hevalê me bû. Di kovara me de rexneyên bêta-wiz hatin nîvîsîn di derheqa Yekîtiya Niştîmanî û qewimandînan rastîya pêşdîtinên me nîşan dan. Lê Elî Eskerî dijminê xelkê Kurd jî nîn bû. Ew şerkarekî, mîlîtanekî welatparêzê Kurd bû ku dixwest li gora bawerîyên xwe jibo rizgarîya gelê xwe şer bike; ew serokekî eskerîyê jêhatî, ceribandî û ji alîyê pêşmergan de hizkirî bû. Li hemberî kes an hêzan şerê siyasî û îdeolojîk kirin xwezayî (tabîl) û pêwîst e. Lê şerê siyasî ne şerê eşîrtî ye. Kuştîna welatparêzekî Kurd, kuştîna mîlîtan û şerkarekî pêşverûyî Kurd curm e, qetl e, xizmeta rejîma faşîst a Bexdayê ye.

Di şerê bêgîdî yê nav du dewletên dijmin de jî girtî û dîl xwedîyê hin mafan (heqan) in, wisa bi hovîtî û hirhopî na yên kuştin. Gava ku Vîetnamîyan pilotên emerîkanî yên ku wela-tê wan dişewitandin dîl digirtin, dîsa wan ne dikuştin, davê-tin girtîgehê.

Xwîna gelek welatparêzên Kurd ên Iranê, Tirkîyê û Iraqê heye li ser destên van mucrîmên ku berpirsiyarên rewşa dîlîtî, bindestî û şerpezeyî ya xelkê Kurd in li Kurdîstana

Iraqê. Îro, ne tenê jibo me lê jibo gelek Kurdan Qiyada Miweqet = Qiyada Xîyanet e.

û partîyên pêşverû, demokratîk û laîkên Iranê ye. Tenê enîyeke fireh dikare li hemberî Ayatolahan û hêzên kevneperestên hindurî û derveyî yên ku li pişt wan in, bibe xurtahîyekî. Di vî warî de jî PDK a Iranê xebatekî ji sektarîzmê dûr dike, giranîya xwe datîne ku di komîteyên şoreşgerî yên bajar- ran de, di meşandin û mîtingan de, di helbijartinan de, ji Cepha Mîllî ya Demokratîka Iranê heta Hizbî Tûdeh, PDK, Fedayîn, Mucahîdîn, Zehmetkêş û komikên çepên din bi hev re bixebitin, tevî hev şer bikin, xirecir û dijhevîyên xwe yên hindurî di hoyên îrohî de rawestînin. Her yek qenc têdigihê ku heke dîktatorî, di bin xelîya dînî de be jî, biserkeve û bicîhbibe, ewê ne tenê pişt yekî ji wan, lê bi dorê ya hemîyan bişkê, ewê jinûve mehkûmî bêdengî û xebata binerdî bibin. Bîndestî û perçiqandina yek ji wan rê vedike ji fetisandina hemîyan re.

Îro Kurdîstana kela demokrasî û azadî ye li Iranê. Ne tenê çavên Kurdên dewletên din, lê çavên hêzên demokratên Iranî li serfirazîya şerê Kurdan e. Lê jibo serfirazîyê hê gelek xebat divê, şer divê. Em ji niha ve nikarin bêjin ku emê, çî di-qewime bila biqewime, biserkevin, gote ji nûçegihanên Azadîyê re Dr. Qasimlû, berî ku bî serveke: Şoreşa me hê wekî fîdanekî teze ye, rojbiroj reh digîre, xurt dibe. Lê jibo girbûn û bejndana wê wext pêwîst e. Niha bayekî xurt heye ku dikaribe hebûna wê ya nazenîn bişkêne".

NÛÇEGIHANÊN AZADÎYÊ

Hejmara ku tê seranser li ser BIHARA AZADÎYÊ LI KURDISTANA ÎRANÊ, bend, foto û roportajên nûçegihanên me.

Fotoya qalpaxê: Pêşmergên PDK a Iranê li ser tankan notirvanîya Qışla Mahabadê dikin.

(J. Bertolino)

TIRKÎYE

BI KUDA DIÇE ?

Sistema kapîtalîsta cîhanî di bihureke teng de ye. Di vê bora neke kûr de her dewlet di etirîya canê xwe de ye, her yek di xwaze be rê agir ji xwe dûr bike. Ev boranê dendikê navînî yê sîstemê bi rengekî xurttir û xeddartir eksî kapîtalîzmên dorhêlî, zêde-girêdayî û paşdemayî dike. Dorgerkê (peykê) emperyalîzmê Komara Tirkîyê îro di pêşirtengîya girantira dîroka xwe de ye.

Refaha welatekî li ser du pîyan ava ye; sa nayî û erdçinî. Gava ku yek ji wan kêmbew welat dikule, gava her du jî têkûz nîn bin, sistolekî bin pêşveçûn, çawa di zmanê xelkê de tê gotin, bi qûnkaşkê ye, di dema fuze û spût nîkan de. Li Tirkîye, li gora daneyên resmî (1) di 1972 an de 65% xelkê li gundan diman, bi erdçinî û dewarxwedîkirinê bilî bûn. Gava ku di welatên pêşveçûyî de parekî piçûktirê xelkê (li USA 4%, li Fransa 16%) bi saya zanîna teknîk dikarin têrî hewcedariyên welatên xwe zad, fêkî bighînin, dewaran xwedî kin û serdê bifroşin derva pê dovîzan bidest xin, li Tirkîyê hatina 65% xelkê di şertên îklîmî û xwezayî yên bi awakî îstîsnaî qenc de nikarin têra rûniştevanên dewletê nake. Çima? Ji ber paşdamayîna teknîkên erdçinî û dewarxwedîkirin, jiber zincîra peywendiyên hilberîniyê (îstîhsalê), bêguman.

Di sala 1979 an de hê reforma erdçinîyê, ku gelek welatan berî sed salan pêk anîye, hê ne hatiye kirin, hê li pir ciyan rênçber û nîvekar bi ga û gîsnan cot dikin erdê dojin, hê gundî bi awayên çend sedsal berê pez û dewaran xwedî dikin û jiber tunebûna siyaseteke piştgirî û teşwîqê bi qaçaxî dibin li dewletên cîran difroşin. Kanîyeke sereke ya dewlemendiyê wisa kor, xitimandî, nevedayî maye. Di vî warî de Tirkîye xeynî mewij, findik, hêjîr û titûnê nikare tiştêkî bifroşe derve û nikare zikê xelkê xwe têr ke.

Deynên giran

Pêşveçûna sanayîyê di nav bêpergalî, bêplannî û hovîtîya kapîtalîzmeke destpêkî de bû ye. Siyaseta ajotî ya talan, ya "zû û bêtir kar kirin"ê bûye. Serma yedar ji rastkirina sa

nayîya giran û hîmî, jî çêkirina rê û tesîsên bin-avahî revîyane, wekî navbeynvanên şirketên derveyî sanayîya sivik a bihevexistinê (montajê) danîne jibo bi lez û bez bazara hindur bişêlînin. Ev siyaset weka tevgera merivê ku bê cotkirin, tov reşandin, genim çinandin, bi avakirina aşê dest bi çêkirina tûrikê arvan û frotgehên nan dike jiber ku zane ewê xelk nan bistîne, ewê di nanfrotinê de kar hebe. Gava ku genim tune be û aş negere he bûna tûrik û xaniyên valayên nanfroşan tu derdî derman nakin.

Sanayîya Tirkîyê jî wilo ye. Di welatê Dicle, Firat û gelek çemên din, di yê kanên komir û madenên cihêreng de jibo gera "sanayîya sivik" divê ku enerjî ji derve bê, kaledend (maddeyên xam) ji derve bê, makîne û tesîs ji derve bê; gava ku yek ji van derengî ket an nehat çerxa vê sanayîya sistolek nagere, betalî, bihayî, tengasî, qatî dest pê dikin. Ev sa nayî girêdayîniya bi derve ve kêmbew, dija ne rojbiroj zêdetir dike. Jibo çêkirina bêtir hilberîyan (mamûlan) di vî derve bêtir frotişk bîn kirin, bêtir dovîz hewce ne. Herwekî tiştêkî birûmetî Tirkîyê tune ku bifroşe û pê dovîzan bidestxe he

ta îro du kanî hatinê xebitandinê:

a) Şandinê karkerên ku li Ewrûpa rojava kar dikin. Ev şandin di 1974 an de qasî 1.4milyar dollar lê di 1978 an de kêmtirî milyar dollar bû. Lîrayê tirk mehbimeh ji rûmeta xwe dikeve, ne tenê biyanî (ecnebî), lê karkerên tirk jî bi vî diravî (pereyî) îtbarîya xwe naynin, mark, frank, hwd. ên xwe dispêrin banqayên Ewrûpayî. Bi kurtî, ev kanî berebere kêmtir av dide.

b) Deyn kirin. Heta îro bi bêhesabîyeke kê-

dîtî bûrjûwazîya tirk daye vê kanîyê û Tirkî yê xistîye bin deynên gelek giran. Roja îroyî bi 20 milyar dollar deynên derve, -8 milyarên wan divê ku di demekî kurt de bên dayin- yek ji deyndartir dewletên cîhanê ye. Temîna tekî xurt ê Tirkîyê tu ne ye jibo dayina van deynan, loma kes îndî zûbizû naxwaze deynên nû bidê. Mirovhizî, dostanî, hevalbendî tune ne di peywendîyên dewletên kapîtalîst dan; kar, kêrha û " hesabên sar" hene.

zarana gundîyên ku ji gundan tî qewitandinê rojbiroj rêz û sefan betalan gurtir dikin. Îndî kargehên Ewrûpa kapîtalîst jî nîn in jibo kerîyeke ji van betalan berbixwe bikînin. Idare, fabrîqe û kargehên dewletê li di jî hemî rastek û qanûnên aborî bi kesên xwedîbext û "bixweyî" hatine dagirtin û werî mandin; timî ziyandar in.

Di van hoyan (şertan) de li hemberî rejîmê pêlên dijekarîya (mixalefeta) civakî radibin, tevgera azadîxwaza karkeran xurt dibe, bûrjûwazîya piçûk a bajar û gundan, gundîyên belengaz û bêerd, Lumpen-proleterya berbajaran û heta hin berên bûrjûwazîya navîn neqa îlîya xwe nîşan didin, berê xwe ji "hêvîya xwe Ecevit" vedigerînin. Lê ev nîşan nade ku ev çîn û tebeqe jibo şorşa sosyalîst amade ne. Hê li Tirkîyê partîyeyeke şoreşgera ku dikaribe vê dijekarîya civakî ya pirîcar ne-êşkere, mijdar, bi lêv û deng bike, îtbarî û badikerî bi wan bide peyda kirin, bibê namzetê karîne (îktîdarê) tune ye. Perçebûn û pevçûnên giranên ku niha di nav komikên çep û sosyalîst de hene hêvîya di demekî nêzik de peyda bûna hêzekî wilo, mixabin xurt nakin.

Peyivandin û bazarên ku ev bûn çendikû çend meh in di navbeyna hikûmeta Ankara û berpirsîyarên IMF (Kewara Diravîya Navneteweyî) dom dikin tilî datînin ser dereca qelsîya îtbarî û qedrê Tirkîyê di nav dewletên biyanî de. Ecevit û wezîrên wî vir de wê de diçin tî jibo parsa çend milyon dollaran.

Fuzeyên nav-heverdayî (nav-qitayî), îmkanên casûsîya ezmanî, rûmeta stratejîk a Tirkîyê di rojhelata navîn a ku ji xwe di bin destê emperyalîzmê de ye, ji berê pir kêmtir kirîye û îndî kes zehf guh nade nazî û weynekîya wê. Çiqas Ecevit an Demirel dixwazin nîşandin ku ewê dikaribin ji Israîl û Mîsrê çêtir xulamîya USA û NATO yê bikin jî kes ew qas guh nade wan.

Lê ne bi çend milyon ne jî bi du-sê milyar dollaran Tirkîye ji pêsirtengî û boranê

nafilete, bê guhêrandinên aborî, civakî û siyasîyên kûr.

Enflasyona ewrûpayî, bihabûna tiştên ku ji Ewrûpayê tî kirin, borana enerjîyê (bihabûna neftê) vê boranê kûrtir û xeddartir dikin; gava ku di sermayê de yê tîr û xurt (Ewrûpa, USA) tenê zekemî dibin, qelsok, birçî û nexweşokên wekî Tirkîyê ewê satilcanî bibin û dikarin pê bimrin jî. Ji xwe bazara hindurê Tirkîyê hew dikare frotişkên "sanayîya sivik bimehîne û qalîte û bihayê van frotişkan dest nade frotana wanî derva. Ev jî yek ji sedemên borana niha ye û kanîyeke betalîyê ye.

Helbijartinên resmî hebûna 3 milyar betalanan qebûl dikin. Bi milyonan nîv-betalan betalên veşarî yê ku di bajaran de bi frotina şeh û neynikan, bi ya gore û hêşînokan, an bi ya çend meywe û hêşîna tîyan dijîn ne di vî hesabî de ne. Bi sedhe-

Ecevit bixwe bi vê dijekarîya civakî zane, serwext e. Bi hin tedbirên rojane dixwaze dengê her yek ji van tebeqeyan jibo demekî bibire. Loma ew zorê dide darpxanê! Îro di Tirkîyê de kargeha ku betalnanîne ya çêkirina banqnotan e. Di 1978 an

betalî , bihayî , belengazî

de ew ji sala berê 58%(2) bêtir banqnot çê kirîya. Ev perê kaxezên li hemberî kîjanan rûmet û frotîşk ne hatine çêkirin, di nav nîvxelayî û qatîya Tirkîyê de bûye yek ji sedemên girîngtirê û enflasyonê ku di 1978 an de gihîşt kêrta bilinda 74%!(2)

Xuya ye ku di vê bager û boranê de bûrjûwazîya Tirkîyê îndî nikare bi tedbîrên aborîyên edetî û qanûnî, di-jekarîya ku di kûrahîyên civakê de li hemberî rejîma wê peyda dibê rawestîne, bipelişîne. Li ber îhtimala wî dakirina karîna xwe, ew berebere karê "tedbîrên îstîsnaî" dike. Çi-ne ev tedbîr?

Hewcedarî û daxwaza bûrjûwazîyê rastkirina "rejîmke xurt" -mimkin be faşîst-e ku dikaribe dengê li hemberî wê hildibin bifetîsîne, digulistana bêdrî de li kêf û talana xwe binêre. Lê rejîma ku kerîye kî mezinê xelkê qebûl nake, mînakên dîrokî nîşan didin, nikare li piyan bimînin. Serde, li derve jî ewê gelek hê-

zên demokratîk li dijî wê derin û Tirkîye ne Iraq an Irana xwedî neft û dollaran e ku dikaribe guh ne dêre ramana (efkara) demokratîka ewrûpayî. Jibo stendina "alîkarî" û deynan divê ku dikaribe xwe bi "rûçikekî maqûl" kêmezêde demokratîk diyarî dostên xwe yî derveyî bike.

şerê ideolojik

Di nav daxwaz û van pêkahîyên (realîtên) hindurî û derveyî cîrê xê manevraya bûrjûwazîyê teng e. Ew niha bi hemî heza xwe dike ku di nav tebeqeyên xelkê yên ku ji guhêrandin û pêşveçûna ditirsin, daxwaza "hizûr û îstîkrarê", ya "rejîmeka xurt" a ku dikaribe wan saz bike, bide peydakirin. Di vê rêyê de şerê îdeolojik xwedîyê cîhekî berbiçav e. Di milekî de ew bi maşîk û berdevkên xwe terorîzm û "anarşîzmê" peşve dibê, mîlîtanên pêşverû dide kuştin. Gava ku hikûmet di ecz û bêkari-nîyê de nikaribe pêşî

li vê "anarşîzmê" bigire daxwaza "hikûmeta xurt" li nik gelek kes û tebeqan wekî "ehwenî şer" peyda dibe.

Li di vî şerê îdeolojik de topa giran, ji berê de xofa "veqetandinxwazên Kurd" ên ku dixwazin welat "perçekin" e. Seferên dawîn li dora "talûka kurdîtîyê", li dijî Şerafettin Elçî, Mehdî Zana, hwd.. perçeyekî vê seferê ye. Niha di 15 vilayetên Kurd de hikmê leşkerî, îdara orfî hatîye danîn; ji sê ordîyên Tirkîyê 2 li Kurdistanê ne. Bûrjûwazî bi vêjîna şovenîzma tirk dixwaze sefên "mîlletê Tirk" bişiddîne, di bin xêlîya "yekîtîya neteweyî" li hemberî "talûka perçebûna welat" de daxwazên karîker û cotkarên Tirk bifetîsîne û wan li dijî gelê Kurd rake, sazûmana xwe re tecîleke nû bidest xe.

► Hejmara ku tê: ◀
HILKIŞANA FAŞİZMÊ
EM ÇI BIKIN?

(1) 3. Beşyılılık Kalkınma Planı, 1973-1977, DPT, Ankara
(2) Le Monde, l'année économique et sociale, 1978

Zirt û fortên Ecevit

France-Inter, radyoya dewletî ya Fransayê roja 10ê gulanê gazt mîlîtanektî Kurd kir ji bo qala rewşa Kurdan bikin di bernama nûçeyên saet 13 an de. Heva lê Kurd di peyivandina xwe ya 14 deqîqan de zulm, tade, zorkart û neheqîyên ku xasme li Iraq û Tirkîyê li Kurdan tê kirin bi mînak û agahdarîyên têkûz, bêguman û bêwerimandin ji milyonan guhdarên

fransîz re diyar kir. Ecevit jî ew ro li Fransa bû jibo li ber Meclîsa Ewrûpayî gotarektî bêje û ew tevî ho girên xwe guhdarîya radyoyê dikir ka ewê qala hatîna wî ya Fransayê bikin an na. Kestî qala wî nekir û serda li ser Kurda hat peyivîn. Ecevit çawa dî nê bû! Ew jî hikûmeta fransîz re "notaktî pro-testoyê" da û gote "hêke hun van tevgerên xwe yên dijî dostanîyê

bidin dom kirin, çîh û heqê gotîne bidin veqetandinxwazan, heye ku em jî destûra xebatê bidin Breton û Korsîka ytyan!" Ecevit çî zikê xelkê xwe têr kir îca ewê destûrê bide Korsîkaytyan! Ew li çaralî parsî çengektî dollar dike jibo xwe ji îflansa malî xelas ke, lê hê jî ji kêrta xwe nakeve, ji perda jorîn da vêje! Bêguman kestî li Fransayê guh neda zirt û fortên wî.

MIRINA BARZANÎ

Sermiyanê PDK a Îraqê, serokê serxwerabûna dirêjtirîn a Kurdan di sedsala XX an de (1961-1975), Mistefa Barzanî roja 2 ê adarê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (USA) mir. Cendekî wî bi bala firê anîn Tehranê, ji wir bi helîkopterekî leşkerîyî Îranî birin bajarê Şîno (Oşnowiye), nêzikî tixûbê Iraqî û li wir veşartin. Zaroyên wî, endamên partîya wî û pênc-şêş hezar dilxwazên wî yên Kurd tevî şîna wî bûn.

Barzanî yek ji şexsiyetên Kurd e ku heta niha li serê bêtir minaqeşe hatine kirin û tiştên dijîhev hatine gotin û nvisîn. Dorbidor jê re "Melê Sor", "Generalê Leşkerê Sor", "Mêrxasê Neteweyî", "Serok", "Xaîn", "Nokerê Şah û CIA" hate gotin. Hinên ku duh di bin siya wî de bûn, wî hildikişan ezmanan, îro ewî di herîyê de dadikin jibo "xeletiyên xwe" yên berê bidin jibîr kirin. Hin hevalên pêşverû jî bawer dikin qala Barzanî nekirin, pirsê fetisandin ewê pirsê Barzanî ji meydanê hilîne û loma piran ji ser wî nvisandinê direvîn.

Pirsa Barzanî pirseke dîroka Kurdistanê ye. Û pirseke ne piçûk e; girîng e. Jibo zelaliya îdeolojîk û xirucandina mijên ku di hin mêtîyan da ne minaqeşe kirina vê pirsê pêwîst e; ferz e. Bi qencî an bi xerabî Barzanî mora xwe li ser dîroka bi hindikî 20 salên dawîn ên gelê Kurd xistîye; em nikarin bi derbekî xêlîyê bikşînin ser van salên dîroka me ya nêzik, xêzekî bikşînin ser. Karê şoreşgeran pêkahî (realîte) û qewimandinan veşartin an nedîtînin e; dijane, divê ku ew pêkahîyan kûr û dûr bibînin, wan fehm bikin da ku dikaribin jibo guhêrandina wan bixebitin, bi dersên ji qewimandinên borî derxistî riya pêşîya xwe ronî bikin.

Me di kovara xwe de heta niha gelek tiştan di derheqa Barzanî de, di ya danûstanên wî yên bi Şah, CIA û Israîl re nvisîn û kesî ku bawerî û dîtînen me li ser vê yekê nizanibe, em hêvîdar in, ne maye. Mirina wî dibe wesîle jibo tehlîleke giştî li ser jiyana wî, serê wî û rola wî di dîroka Kurdan de.

Barzanî kî bû?

Mistefa Barzanî di sala 1904 an de li gundê Barzan, nêzî tixûbê Tirkîyê hate dinê. Malbata wî ya şêxê nexşebendî bû û serokatîya dînî û siyasî ya eşîra Barzanî û yên eşîrên din ên navçeya Barzan, Şirwanî, Mîzûrî, Barûşî û Dola-Marî yan fikir. Xelkê Barzan bi erdçînî, dewarxwedîkirin, nêçîr û êzingvanîyê, di aborîyeke girtî de dijîn. Rê û dirb di van çiyayên dorhêla Zab a Mezin kê, danûstan bi derve re qels in. Edet û awayên kevnaretirên Kurdan di van navçeyan de mane.

Di Kurdistanê destpêka sed sala XX an de şerê navbeyna eşîran li ser çêrê, pez, jinrevan din, milk xurt bûn û Barzanî bi xwe di pêvçûnên dijî eşîrên Zîbarî, Brêfkî û Bradostan de bûbûn xwedîyê şerkarîyeke bêhempa; dost û dijminan ji wan fikara fikir. Lê ewan pirîcar jî şerê Leşkerê Osmanî (Roma Reş) kiribûn; Osmanîyan kalikê Mistefa Barzanî bidarda kiribûn. Hê ew

li ber pêşîra dayika xwe bû kîngê "Kumsorên Romê" ewî tevî malbata wî avête zindanê. Di sala 1909 an de, gava ku Xelîfe Selîm û mirîdên xwe li Bedlîsê serî hiltînin, Barzanî jî li alîyê xwe di bin serokatîya Şêx Abdul Selam -kekê Mistefa ku piştî kuştina bavê xwe di 1908 an de bûbû serekeşîr- radibin şer. Osmanî jîbo wan ji Kurdên Bedlîsê veqetînin daxwazên Barzanîyan qebûl dikin, leşkerên xwe jî navçeya wan dikişînin. Barzanî jî şer dirawestînin û bi vî awayî Osmanî pêşîyê serhilanîna Bedlîsê dişkênin dûre vedigerin ser Barzanîyan; qewlê ku dabûn wan bicîh naynin û di 1914 an de Şêx Abdul Selam bidardadikin. Ev jî Mistefayê hêdeh salî re dibe dursa siyasî ya pêşîn û ew îndî zûbizû, xeynî ji merivên eşîra xwe, bi kesî, bi gotina kesî bawerî nayne. Ewê sîh sal sînde bûyerên Mahabadê, dayî û bicîhneanî vê xêza kurmê hê têkûztir bikin.

Pîştî Abdul Selam, brayê Mistefayê mestir, Ahmed li gor edetê eşîrê dibe şêx û serekeşîr. Mistefa di vê malbata dîndar de bi erebî dixwîne û dibe Mele. Ewê heta dawîya emrê xwe gelek di bin tesîra dîn de bimîne, bi ayetên Qurane rabe, runê, bipeyive, bi qedere bawerî bîne, li pirsên kompleks û dijarên cîhana îroyî bi çavên mirovên çend sedsal berê binêre. Di xortanîya wî de Şêx Mehmûd Berzencî doza Qralîya Kurdistanê dike, geh bi Iraqê re geh bi Îngilîzan re şer dike; lê Barzanî tevî şerê ku ew lê serokîyê nekin nabin. Di salên 1931-1934 an de îcar Şêx Ahmed tevî Barzanîyên xwe serî hiltîne, dixwaze leşkerên Iraqî ji Barzan derînin. Balafîrên Îngilîz alîkarîya Bexdayê dikin, bi ser Kurdan dikevin. Şêx Ahmed û Mele Mistefa pêşî sirgûn dikin nîvroya Iraqê, dûre Sileymanîyê. Di vê nawenda kurdîtî ye de, Barzanî ji bajarîyan hîni ramanên (fikrên) ne teweperwerîya (nasyonalîzma) kurdî dibe. Şerê wî ji wir bi

şûn de îndî ne tenê jîbo Barzan e lê jîbo rizgarîya Kurdistanê ye. Di salên şerê cîhanîyê II an de, gava ku Ingilîz bi şerê Elman ve bilîne, Mele Mistefa dixwaze bextê xwe bicêribîne û Barzanîyan radike şer. Şer fireh dibe, li tevahîya Kurdistanê Iraqê belav dibe û ji 1943 an heta 1945 an dom dike. Lê ev şerê ji dinyayê tecrîtkirî bi tivingên Brno nikare ji heqê leşkerên nûjenên (modernên) Bexdayê bê. Mela Mistefa tevî şerkarên xwe derbasî Mahabadê dibe û xwe dixê bin fermana Qazî Mihemed. Piştî îlana Komara Kurdistanê (22.1.1946), serekkomar Qazî Mihemed Mele Mistefa dike general û fermanarê pêşmerga, leşkerên neteweyî (mîlî) yê Kurd.

dema mahabadê

Di gulana 1946 an de Leşkerê Sor xwe ji Îranê fireh -dikişîne û çend meh bi şûn de Komara Demokratên Azerbeycanî bê şer, bê berxwedan dikeve. Leşkerên Îranî ku bi alîkarîya Ingilîz û Emerîkanîya jinûve tenzîm û çekdar bûne, dikin bi manîya "emniyeta helbijartinên jîbo Meclîsê" bikevin Mahabadê jî. Berxwedîn? Berxwenedîn? Berpîsiyarên Kurd di dudîlîyê de ne. Jîbo Qazî Mihemed û dora wî piştî ketina Tebrîzê berxwedan û şer tewş e; bê feyde ye. Serekê Pêşmerga General Barzanî jîbo berxwedanê ye û tevî hêzên xwe dikişê alî Naxadê. Jîbo wî, Qazî Mihemed "xayîn e", dixwaze Kurdan bê şer teslîm bike. Tinaza dirokê, ewê 28 sal şûn de dev ji şer berde û jê re jî "xayîn" bê gotin.

Şah gizîrên xwe dişîne cem Barzanîyan û divê şer mekin, em li ser xwestekên we bi peyivin. Barzanî bixwe diçe Tehranê lê tişteke bidest naxe; Şah tenê destûrê didê ku ew hêzên xwe ji Îranê bê şer bikişîne Iraqê. Di adara 1947 an de Şah Qazî Mihemed û du wezîrên wî li Mahabadê li ser Mey-



dana Çarçiran bidardadike. Komara Mahabadê indî dikeve dîrokê. Barzanî tevî merivên xwe dikişe navçeya Barzan. Bexda ji wan re dibêje: "Xwe bidin dest, emê we bibexşînin". Lê Barzanî zane ku dinya ne sayî ye û rojên dijwar li pêşîya wan in. Ew tevî 500 şerkarên xwe havilkar dikin û berê xwe didin Yekîtiya Sovyetîyê. Geh di tixûbê Iraqê geh di yên Tirkiye û Iranê de bi şer û hêwirze, di hoyên dijwar de, ew xwe dighînin Ermenistanê û xwe davên bextê Sovyetistanê. Piştî vê "Meşa Dirêj", bi melevanî derbasbûna çemê Arasê, Ermenî wan dispêrin Azerbeycana Sovyetî, kîjan wan dişîne Uzbekistanê. Barzanî û şerkarên xwe li wir bicîh dibin, hîni rûsî dibin û bi erdçînîyê bilî dibin. Piraniya wan ji Rûsan ji xwe re jin tînin. Wan salên han yên qenctir û xweştir ên dîroka sovyetî nîn bûn. Piştî dijwarîyên Şerê Cîhanê yê II a, tunebûn, kêmasî, qatî, xof hebû, ji cîyê xwe, ji bajarê xwe livitîn, biser Kurdên

Qafqasyayê re çûyin, bîhna xwe derxistin ne mimkin bû. Ewê piiraniya Barzanîyan, Mele Mîstefa bixwe, ji Sovyetistanê antî-kommunîst vegerin.

Di 1956 an de Kongre ya 20 î ya Partîya Komunîsta Yekîtiya Sovyetî dicive; tê de rexneyên xurt li ser dema xofdara Stalîn tê kirin û rûpelek nû destpêdike di dîroka sovyetî de. Salek bi şûn de, Mele Mîstefa bi qaçaxî li bala-firê siwar dibe diçe Moskova-yê ku Xrûşçov bibîne, rewşan Kurdan pê bide zanîn. Piştî girtin û hin dijwarîyan ew bi rastî Xrûşçov dibîne û Serokê Sovyetî pê re ferman dide jibo ewî li Moskovayê bicîh kin û qedrê wî bigrin. Barzanî li wir pêlekî li Akademîya leşkerî hîn dibe.

Di 14 tîrmeh (temmûz) 1958 an de General Abdulkerîm Qasim rejîma paşverûya xulamokê Ingilîz Nûrî Seîd diqelibîne, azadîyên demokratîk dinase û bratiya Kurd û Ereban îlan dike. Barzanî jê re têlekî pîrozîyê dişîne. Di bersiva xwe de, Qasim, ku ji alîyê dê de Kurd bû, pê dide zanîn ku ewê Iraq bi vegera wî kêfxweş bibe. Gava Barzanî 1959 an de vedigere, Qasim wî bi debdebe qebûl dike, qesra Nûrî Seîd pêşkeşî wî dike. Partîya Komunîst a Iraqê û PDK li Barzanî xweyî derdikevin, li serê pevdiçin. Lê Barzanî kê-m-zêde yê berê bû; dîndar, bi orf û edetên eşîrîyê -xasme yên Barzanîya- ve girêdayî. Ew ne bi komunîstîyê ne jî bi demokrasîyê bawer bû; neteweperestekî xwerû bû. Ewî sermiyanîya PDK a Iraqê qebûl kir û di bin baskên wî de Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî bi zora tîfingên serokatiya meşrû û paşverûya Partîyê (Hamza Evdullah û hevalên wî) tasfîye kirin, ketin şûna wan.

HEJMAR A KU TÊ: **şahê kurdistanê**
barzanîzma bê barzanî

[Faded handwritten text, likely bleed-through from the reverse side of the page.]

Agahdarî û zanebûn kêm in li ser çend sedsalên navbeynî ketina Împaratoriya Medan û îstîlayên Îslamî. Piraniya Kurdan li navçeyên ku îro li Kurdistana Îranê ne û li aliyên Bohtan dijîn. Ewê berebere ji vê "dergûşê" ber bi bakûrê Wanê wisâ jî ber bi rojavayê Diyarbekirê belav bibin, bicîh bibin.

Bi nav Kurd di tixûbên Împaratoriya Îranî de ne; lê di rastiyê de ew jiyana xwe ya eşîrî ya serxwe dijîn, geh şerê hevûdin dikin, geh heta Anadolê diçin jibo qralên Bergamayê şer dikin (171 berî dema me). 400-401 sal berî dema me generalê yewnanî Ksenefon qala şerî karîya "Kardûx" ên Bohtî dîkê û piştî wî dîrok nasên klasîk vî parê welatê Kurdan "Korduen" binav dikin. Bi awê zaneyê kevnareyê navdar Strabon tixûbên (sînorên) "Korduen" heta deşta Mûşê û Diyarbekirê dikişîyan. Ermenî bixwe ji van navçeyan re "welatê Kardû" (Kardû bi aşûrî xurt, mêrxas e) digotin û di sedsala I a berî dema me, qralê wan Tigran II dest bi zevta welatê Kardûyan dîkê, qralê "Kardû" Zarbiyan dîde kuştin. Lê zevta Ermenî pir dom nake. Dîroknivîsên kevn salix didin ku li dora sala 50 ya piştî dema me, "Kardû" nûve azad û serxwe dibin. Di sala 115 an de qralekî wan hebûye bi navê Manîsar. Lê li ser jiyana û kirînan wî agahdariyeke tekûz nîne.

Pêşiyên Kurdan "Kardû" an "Kardûx" hindê çibigre hemî zerdeştî bûne û vê ola kevn te vî hin baweriyên kevnîtir (hebandina hêzên xwezayî, ya rojê) heta dema îstîla ereban dom kirine. Li çar aliyên welatê "Kardû" yan "Agirgeh", "Hurmezgeh" hebûne.

ola kurda ya kevn

Ql û dîne xelkekî ji jiyana civakî û aborî (ekonomîk) ya wî rehên xwe dîkşîne. Wekî hemî gel, gelkok û qebileyên hindû-ewrûpayî di civaka pêşiyên Kurdan (Med, Mîtanî, Kardû, hwd.) de jî sê qor hebûn. Li jorê serweriya siyasî û dînî, di navê de şerkar -yên ku karê wan tenê şer kirine - û li jêre qora fi-rehtir û mestir ya cotkar û şivan û gavanan.

Di wê dewranê de şer, pevçûn, talan parîkî bûn ji jiyana rojê, ji ber kêmasiya hatinên erdê eşîr û gelkok şerê hevûdin, neyartîya hevûdin dikirin. Ewê ev rewşa han jî xwe di warê dînî de nîşan de.

Di ola (dîne) Iranîyên berî zerdeşt de gelek xweda tên hebandin. Ev xweda jî weka eşîrên wê demê du ber in û timî şer û hemberiya hev dikin. Ji berê xwedanê qenciyê re BAGA (1) -yên ku dewlemendiyan dibexşîne - an YAZATA (2) -yên ku layiq in ku jê re gorî bînan dayin - tê gotin. Ji xwedanê bera xirabiyê re DAIVA dibêjin.

Xwedanên her berekî jî wekî civaka hingê di nav sê qoran de tînan parvekirin. Mestirê Xwedanê Qenciyê Hurmiz an Ahura Mazda ye ku tevî şeş "giya-

KURDISTANÊ




nên pîroz" li riyê erdê çi yî qenc û baş hebe afirandîye, lê bixwe têkilî karê merivan nabe Paşê tèn Baga yên şerkarî û yên îdara dinê. Ew di şer de piştî qenc û merivên li ser rîya rastîyê ne dikin û piştî mirinê jî qenc û xeraban ji hev dineqînin li ser pîra Çînvatê! Navdarê van Xwedanan Mehr e, ku gotina mihrîvan ji navê wî tê.

Di rêza jêrîn an xwedanên qencîyê de yên ku bi "karên piçûk" bilî dibin, alîkarîya cotkar û şivanan dikin tèn. ANAHITA, xweda ya bereket û evînê, VAJÛ (ji Bayê) xwedayê Bayê di nav vê qora jêrîn de ne.

Heçî DAIVA, ew berpîrsîya-rên xerabî û nexweşîyên dinê ne, naxwazin ku meriv di xweşî û rastîyê de bijîn. Serekê wan EHREMEN e ku rasterast dijmina hîya HURMIZ dike. Dûre tèn Daîva û DRÛJ (ji derew) ên tayê, webayê, mirinê. Yek ji xeddartîrê DRÛJ an daîvayên mê, EZ e. Xwedaya tolazî û şoxîyê (şehwê) ye. Ew ket laşê kî, wî dixîrîne, rê û armanca wî pê dide windakirinê.

Meriv sedemê her kêmasî û xirabîyên xwe di bîbextîya van Daîvan de didîtin. Gelo sibê zû nikaribûn ji nav ciyan rabin herin ser karê xwe, ew ne sûcê wan bû, ji dest xirabîya BÛŞYAŞTA, xwedaya tiraliya sibehî bû.

Xwedan ne tenê qencî û xirabîyê kiribûn nav merivan lê wisa jî nav dewaran. Dewarên ku bi dest HURMIZ û BAGAN hatibûn afirandin (ga, çêlek, mî, bizin, se) qenc û bikêrhatibûn, xwedîkirin û parastina wan xêr bû. Heçî afirandinên EHREMEN û DAIVAN ew tenê bi kêrî ziyân û xê



Rûpeleke Avesta'yê (ji destnûsa li Zanîngeha Oxfordê parastî)

rabîyê dihatin (mar, beq, dûpişk morî, hwd.) û kuştina wan qencî bû.

parastina jîyanê

Vê ola pêş-zerdeştî ji hewcedariyên aboriyê xelkên Îranê zabû. Di havînên germ û zuwa, di zivistanên sermayên hişk de ji yan dijwar e, hatinên erdê têra meriva nakin. Îsraf, bêtedbîrî dikarin bibin sedemê xelayî û birçîbûnê. Şerên giran ked û xebata bi çendî dijwarî pêkanî dikarin bi derbekî heder bikin. Loma ji cotkaran re xwedanên bereketê, yên mihrîvanîyê (rehmê), ji merivan re yên qencî yê hewce ne ku ewan li hemberî ev qas dijwarîyên xwezayî, biparêzin. Loma di bingeheên xwe de ev ol jîyanê di her alî de teşwîq dike; xwarin, dewlemendî afirandin, berhevkirin û parastin, zêde zaro çêkirin qencîyên mestir in. Rojî, îsraf xerabî ne.

(dûmahik heye)

(1) Gotina BEG ji BAGA tê. Di rûst de hê jî BOG xwedê ye. Di zmanên hîndû-ewrûpayt yên din de jî xwedî (malik, beg) û xwedê ji qirnektî dizên.

(2) Hê jî gelek Kurd ji xwedê re Yezdan dibêjin ku ew ji YAZATA tê.

Ji Dîroka Kurdistanê

KARÛX û WELATÊ

KARÛXAN

AN KURD Û KURDISTAN DI WEXTÊ YEWNANÎSTANA KEVIN DE

Yek ji kevintirîn nvîsar li ser pêşîyên Kurdan "Anabasîs an Parekişana deh hezaran" e. Fermandarê Yewnanîstana kevin Ksênefon wê nvîsandîye û tê de qala şerê ku bi Kar dûxan re kirine dike. Nvîsara Ksênefon cara pêşîn di kovara HAWARê hejmara 32 a, sala 1941 an bi kurdîya Herekol Azîzan derketîye. Hunê li jêrê dûmahika hejmara V a bixwînin.

Hinek ji kardûxan giha bûn hev û ajotî bûn ser yewnanên ku ji par re ma bûn. Kardûxan ew bi tîr û kêvan û kevir kuştin, hinek jî birîndar kirin. Ji xêra xwedê re yewnanên ko ji par re mabûn hindik bûn. An ne birekî ordîwê î mezin bihata şerjê kirin.

Bi şev em di gundan de man. Kardûxan li ser çîyan agir da da bûn. Me guhdarîya hev dikir.

Bi şefeqê ve herçî zabît û kumandar, gihane hev û qerardan ko barxana ordîwê sivik bikin û hêsîrên ko vê paşîyê hati bûn girtin, berdî. Ji ber ko qelebaxa lixa hêsîr û dewarên em aciz dikirin. Eskerên ko li wan miqatê dibûn nikari bûn şer bikin. Hêsîran nanê me jî dixwar. Li ser vê qerarê ji dewarên baş heçî ko ji me re

divîya bû me ew ji xwe re bijartin û ên mayîn berdan.

Piştî taştîyê ordû bi rê ket. Rojê pê de em meşîyan. Me carina şer dikir, carina jî me bîhna xwe dida.

Sibetirê bapûkek li me qelibî. Digel vê hindê divîya bû em bi rê ve herin; ji ber ko zadê me ne ma bû.

Xrîsof da bû pêşîyê, Ksênefon di dimdârê de ma bû.

Kardûxan derbeke xurt li me da. Kardûxan nîzingî li me dikir û kevir û hesin li me dibarandin. Yewnanan dida pey û jî par re dikisiyan. Bi vî awayî em ji rêveçûnê diketin. Gava dijmin li me dişîdand Ksênefon eskerên xwe disekinand û şargeh dikir. Me elam dida Xrîsof; wî jî eskerên xwe disekinand. Lê carekê Xrîsof li

şûna ko bisekine, xwe wer lezand ko ji ade tî der ji me bi dîr ket. Bivê nevê tiştêk li wan qewimî bû. Lê Ksênefon nikari bû here pêşîyê û seh bike. Dimdar jî bêgav ma û lez da xwe. Bi a wakî welê ko meşa me bû bez û rev.

Di vê navê de seg manekî hêja, Klêonîm, hate kuştin. Tîrek li keleka wî keti bû. Tîrê mirtal û kirasê wî î çerm qul kur û ji par re avêtî bû. Segmanekî din, yekî bijarte, bi navê Basyas jî hati bû kuştin. Tîrek di serê wî re çû bû.

Gava ko em gehiştin cihê ko em lê bi mana Ksênefon Ksênefon bi lez çû cem Xrîsof û gazind jê kirin. Ksênefon gote wî ko bi vê lezandî nê dimdar mecbûr bû bû hem bi rê ve here hem şer bike. Dîsan ji ber vê lezandî nê, yewnanan cendekên du peyayên hêja jî li erdê hişti bûn, bêî ko bikarin wan veşêrin.

Xrîsof lê vegerand û got: Tu van çî yayên asê dibînî? (1) Mirov di ser destê wan re nikare here. Divê em xwe li wan biqelibînin.

(Dûmahik li

JINÊN KURD LI SOVYETÛSTANÊ (3)

Sê dotêd Kurda - Asîya Sûltanova, Nûra Cewarî, Cemîla Celîlendamêd Yekîtîya Kompozîtorêd Yekîtîya Sovyetî ne. Asîya Baxşî Sûltanova, efrandinêd kîjanê çawa li Yekîtîya Sovyetî, wisa jî ji sînore wê der têne bicîhanînê, wisa jî şuxulvana Komara Azerbeycanê ya çandîyêye emekdar e. Nûrê û Cemîle berevkerin, dengnûsandin û çapkirina folklor (zargotina) Kurdaye sazbandîyê va mijûl dibin. Doktoraya sazbandîyê Nûra Cewarî wisa jî bi zanistîya lênihêrandina wê sazbandîyê va mijûl e û heta niha monografîyek û çend bendê zanînê çap kirine.



eznîva reşît

PEYIVKARA RADIO-ERIVAN

Li Îdarêd Ermenîstanêye Xwendina bilind da dixebitin dotêd Kurda, doktorêd zanistîyêd bijîşkîyê (hekîmîyê) Donara Nado û Fîrîca Cewahîr, mamostayê zanîngehê (unîversîtayê) cahil Larîsa Nado û Jana Mîro.

Yekîtîya Sovyetî bûye merkeze

ke kurdzanîyêye pêş li cîhanê û wê derecê da keda jinêd Kurd ne hindik e. Bi pirsêd rêzimana zara vê kurdîyî soranî va mijûl dibe doktora zanistîya zmannasîyê Zera Üsiv; lê doktora zanistîyêd dîrokîyê Lamara Paşa bi pirsêd etnografîya Kurda ve mijûl dibe.

Eva îdî 20 salî zêdetir e ku du jinêd Kurdayî hêja - Eznîva Reşît û Sêvaza Evdo - bi Radyoya Erîvanê dengê Kurdêd Yekîtîya Sovyetîyê li cîhanê belav dîkin, qewimandinêd mayîn elamî cîhanê dîkin, guhdara destanînêd me ra dîkine nas. Eznîva Reşîd dîktora (xêberdankira) dereca pêşîn e.

Gelek jinêd Kurd dayikêd mêrxas in. Bo nimûne, rûniştevana gundê Kurdayê Elegêzê Fîla Hamê deh zaro mezin kirine û terbiye kirine. Dota wê Sîsa Huseyn eva îndî çend sal in ku çawa sekrêtara Komîteya navça Aragasêye Partîyayê dixebite.

Pir e keda jina Kurd wisa jî di dereca malhebûna gundîtîyê da Çêlekdoşa Kolxoza ser navê Kongra Partîyayê XVIII a Gulça Simoxweya nîşana Lenîn e; lê çêlekdoşa sovxoza Camûşvanê Zelîxa Wezîr endama Komîteyêye Partîya Kommunistaya Ermenîstanê ye. Bêrîva na gundê Riya Nû Misrîya Elî endama Parlamênta Ermenîstanêye bîindtirîn bûye.

Dotêd me wek dotêd Kurdistanê - Zîne, Eysê, Wetê, Zelîxe, Perîşan, Leyla Qasim mêrxasîya nebînayîdî kin. Dayikêd me jî wek dayikêd Kurdistanê zmanê Kurdîyî xweş dîkine devê me, me hînî erf-edetêd me yên baş, rabûn-rûniştandin, şîn û şahîyê Kurdî dîkin.

BIJÎN jinê Kurdên Yekîtîya Sovyetîyê, kîjan keda xwe ya hêja dîkin tevî xebata avakirina komunîzmê di welatê me da▲▲▲

TÊMÛRÊ XELÎL * * TOSINÊ REŞÎT

Qunci kê Marksîzmê

DAXUYANIYA



KARL MARX (1818-1883)

Lê bûrjûwazî tenê çekên ku ewê wê bikujin çê nekir: wê wisa jî mirovên ku ewê van çekan bikarbinin afirand - karkerên nûjen, proleter.

Hingî bûrjûwazî,ango sermaye girdibe proleterya çîna karkerên nûjen ên ku bê peydakirina kar nikarin bijîn û ku tenê heke karê wan sermaye zêde bike kar bidestdixin,geş dibe.Ev karker ku mecbûr in xwe serê her rojê bifroşin,frotîşk (eşya) in eynî mîna tiş tên bazirganîyê yê din;ew,wilo,li ber guhêrîniyên hemberiyê (reqabetê), li ber hemî pêlgerînen bazarê ne.

Dêşveçûna makîna ûkî dayî de xwastî, bi parkirina xebatê xebatezandina gera makîna, ta karker ji xwegerîyê hwd. (otonomîyê) bêpar kirin û hemî dilkêşîya wê dan winda kirin. Karker dibe dewsokekî başîtê makîne,ji karwarîya (mûamela) başîtîr,yekdîdetir (motontîr) û ya zûtîr hînbûyî tê xwastin. Wilo,mesrefa karkerekî îndî çibigre heta bihayê îmkanên ebûrê ku jibo parastîna wî pîrbûna nesla wî hewce ne,dikeve.Mako frotişkekî û wisa bihayê xebatê jî yê hilberîniya wê ye. Wilo hingî xebat gemarî diraw (heqdest) nîzm dibin.Hê hingî ku makîne û parkirina xebatê pêşvedî çîn giraniya xebatê de dibe an bi zêdebûna saetên xebatê,an bi zêdebûna xebata di deme-

Sanayîya nûjen ji kargeha piçûka mamosta yê pişewer (zenaetkar) ê paderserî fabrika me zina sermayedarê sanayîkar çêkir.Girse yê karkerên di fabriqayê de civandî bi awakî leşkerî hatine hevdesaz (tenzîm) kirin.Leşkerên basîtên sanayîyê ew di bin çavnerîya hi yerarşîyeke tamamî ya berbaz û serbazan de ne.Ew ne tenê koleyên çîna bûrjûwa û dewleta bûrjûwa ne lê biserde, ew her roj,di her saetî de koleyên makîne, serosta û xasme yê jûwayê xwedîyê fabriqê jî ne.Ev zordestî çendî miskîn,kirêt û xedar e ku ew eşkere karê weka armanca xwe ya bilindtirîn îlan dike.

Hingî xebata destî kêm marîfet û xurtahî dixwaze,ango hingî sanayîya nûjen pêşve diçe,xebata jin û zarokan bêtir dewsa ya merran digire. Cihêbûnên emir û cins jibo çîna karkerî îndî rûmetekî civakî nîn in.Indî tenê peywengên (aletên) xebatê hene bihayê kîjanan ligora emir û cins diguhire.

Gava ku mêtîna karker bidestê xwedî fabriqê diqedede,ango kengî evê ha jê re dirawê wî dijmêre (dide), karker dibe derxurê endamên din ên bûrjûwazîyê:xwêdîmal,frotkar,deyndar, hwd.

Sanayîkarên piçûk, bazirgan û miratxurên piçûk,pîşewer û gundîyên piçûk,hemî pêplûka

PARTÎYA KOMMUNÎST

jêrîna çînên navînên berê dikevin nav rêzên proleteriyayê; ji alîkî jiber ku sermayeyê wan ê qels dest nade ku ew azînen sanayîya mezin bikarbînin ew di hembê rîya bi sermayedarên mezin re bindest dikevin; di milê din de ji ber ku bikêrbûna wan li ber azînen nû yên hilberînîyê ji rûmetê dikeve. Wisa ku proleterya ji nav hemî çînen civakê peyda dibe.

Proletarya di gîtên cihê yên geşbûnîyê de derbas dibe. Şerê wê yê dijî bûrjûwazîyê bi peydabûna wê bixwe ve destpêdike.

Pêşîyê karkerên ten ha dest davêjin şer, dû re karkerên eynî fabrîqê, dawîyê karkerên eynî şaxê sanayîyê, di eynî bajêrî de li dijî bûrjûwayê ku sererast wan dimêtîne, keda wan dixwe. Ew berê êrîşên xwe tenê nadin ser peywendîyên bûrjûwayên hilberînîyê: ew êrîşê haletên hilberînîyê bi xwe jî dikin; frotîşkên biyanî (ecnebî) yên ku bi wan re hemberîyê (re qabetê) dikin dişewitînin, makîna dişkênin, agir berî fabrîqa didin û dikin rewşa xwe ya karkerê heyama navîn a windabûyî ji nûve bi-destxin.

Di vê gehînekê de, karker girse (kîtle)kî di nav welat de belavbûyî û bi hemberîyê hûrhûrbûyî ne. Heke biqewime ku karker di tevgereke girseyî de pişta hevûdin bigirin, ev hê ne jiber yekîtîya wan bixwe ye lê jiber bûrjûwazîyê ye, kîjan jibo gihandina armancên siyasîyên xwe yên arizî, mecbûr e hemî proleteriyayê bilivî ne û hê jibo demekî derbasokî dikare vî tiştî bike. Di domahîya vê gehînekê de, proleter şerê dijminên xwe nakin, lê yê dijminê dijminên xwe dikin, ango yê bermayeyên monarşîya tewna (mûtlaq), xwedîerd, bûrjûwa yên ne-sanayîvan, bûrjûwa yên piçûk. Tevahîya tevgera dîrokî bi vî rengî di nav destên bûrjûwazîyê de dicive; her serdestîya ku di van hoyan (şertan) de tê pêk anîn serdestîyeke bûrjûwa ye (1).

Mako, bi geşbûnîya sanayîyê ve, proletarya tenê di hejmarê de zêde nabe; ew di girseyên (kîtle) girîngtir de digihîje ser hev; xurtahîya wê zêde dibe û ew pê çêtir dihise. Kêrha û hoyên (şertan) jiyane dinav proleteriyayê de berebere wekhev dibin hingî ku



F. ENGELS (1820-1895)

makîne her cihêbûna nav xebatê sist dike û diraw (heqdest) çibig-re li herderî dixîne rûhêlekî (sewîyekî) wekhev nizim.

(dûmahîk heye)

1-û vajtyane: Di dahûrtî nîya (tehlîla) dawîneyên rojên 1848 an de, ewê Marx nîşan de ku "bi a wakt ampîrîk, li ser denda (metaa) dtrokîya ku heye û her roj tê nûkirin, bindestkirina çîna karkerî ya di sebat û adarê de pêkhatî, bi eynî derbê bindestîya neyarên wê ant bû komarxwazân bûrjûwa-li Fransayê û çînen bûrjûwa û gundî di şerê dijî tewnayîya (mutlaqyeta) feodalî li ser hemî heverda (kita) ya ewrûpayî" (Travail salarié et capital, Paris Editions Sociales, 1975 p.19)

BINGEHÊN DESTPÊKIYÊN FELSEFÊ

g. politzer

Lê yê ku dibê xasme binî bê xêzkerin sefera bêdengî ya ku Bûrjûwazî li dijî Marksîzmê dike ye. Ewê hemî kir jibo nehêle ku felsefeya materyalîst ditevayê (şeklê) xwe yê marksîst de bê nasîn gelek ecêbdar e di vî awayî de tevayîya xwendina felsefeyê ya ku li Fransayê tê dayîn.

Di xwendegehên navîn de felsefe tê hînkirin. Lê meriv dikare vê xwendinê hemî bistîne bêy ku tu car hîn bibe ku felsefeyeke materyalîst ku Marx û Engels pêkanîne heye.

Gava ku di destpirtûkên felsefê de qala materyalîzmê tê kirin (jiber ku wan divê, bi vênayê, qala wê bikin), timî ji Maksîzmê û ji materyalîzmê bi awakî cihê behs dikin. Bi' rengekî giştî, marksîzmê wekî tenê doktrîneka siyasî pêskeş dikin û kengî ji materyalîzma dîrokî dipeyivin, di vê babetê de qet qisa felsefeya materyalîzmê nakin; paşê ji materyalîzma diyalektîk qet tiştekî nayê hîn kirin.

Ev rewşa han ne tenê di dibistan û xwendegehên de heye; di zanîngehan de jî ev eynî wisa ye. Kirû ya bêtir nîşanker ev e ku meriv dikare li Fransayê bibe "pisporekî" felsefê, xwedîyê dîplomayên bilindtirînên ku zanîngehên fransîzî didin, bêy

zanibe ku Marksîzm felsefeyeke heye, kîjan materyalîzm e û bêy zanibe ku materyalîzma kevneşopî tevakî nûjen heye ku ew marksîzm an materyalîzma diyalektîkî ye.

Em dixwazin nîşan - din ku marksîzm xwedîyê averûyekî (mefhûmekî) giştî, ya ne tenê civakê lê ya gerdûnê bixwe jî, ye. Loma dijane-yî yê ku hin didin pêş, tewş e ku meriv berkeve ku kêmasîya mezin a marksîzmê tunebûna felsefa wê be, û ku meriv, wekî çend teorîsyenên tevgera karkerî, bixwaze li vê felsefa ku ji marksîzmê kême bigere. Marksîzm xwedîyê felsefeyekî ye ku ew materyalîzma diyalektîk e.

Jixwe her çiqas ev sefera bêdengîya, ev

tehrîf û tedbîrên çînên serdest hebin jî, dîsa marksîzm û felsefeya wê destpêdikin ku berebere bîna naskirinê.

(dûmahik heye)

revîzyonîst: ji fransîzî révision jinûve lînerîn, rastkirin, guhêrandin an temamkirina nûfsar û teorîyektî. Revîzyonîst ew in ku dixwazin li metnên nûfsar jinûve bînerîn, bi awakî nû-û carna cihê-tefsîr û ştrovekin. Di zmanê marksîstî de bi tegehîştîniya (manaya) tehrîfkar tê bikaranîn (nîşeya werger)

Yên Ku Jibo Me Ser Kirin ****

THOMAS BOIS

Di sala 1927 an de keşeyekî terr û can, bejn bilind, çay şîn ji dêra xwe ye Bakûrê Fransayê birê diket, diçû Rohelata Nêzik jibo "Gotina Qenc" ya Îsa li nav xelkên "paşdemayî û nezan" ên wê hêlê be lav bike, wan bîne ser "riya heq".

Keşeyê dilsoz û bawermend qasî çil salan li navçeya me ma. Ewî kesî neanî rayê û bixwe jî ne çû ser riya wan. Lê naskirina zman, edet û jiyana Kurdan, bedewiyên Kurdistanê dilê wî fetih kiribûn. Her kesekî li dinê bihuştekek heye, Mekkeyek heye; bihuştamin jî Kurdistan e" digot pirîcar Thomas Bois yê kal ku di êvara jiyana xwe de xwe firekişandibû dê reke piçûk û aram a nêzikahiyên Parisê .

Thomas Bois di sala 1900 ê de li bajarê Dunkerque, li paravên Derya Bakûr, bûye û piştî xwendina xwe di 27 salîya xwe de çûye Mûsilê. Li wir hîni erebî, sûret û kurdî dibe. Ew heta 1932 a li Mûsilê, dûre li dêra Mar Yaqûb dimîne û ji 1936 he ta 1940 an li navçeyên Kurdên Sûrîyê di xebite. Paşê tê Beyrûtê û heta 1965 an li wêderê dijî.

Mirovhiz, hişaza û vekirî, ew hê zû bi tewşbûna bawerîyên xelkê guhê randinê fehmer dibe



û xwe dide xebata naskirin û arîkarîkirinê. Rewşa kurda, bindestî û belengazîya ku gelê Kurd tê de ye hisên wî yên edalet û biratîya mirovî diêşîne û ew bere bere, di tenga xwe de dibe parêzkarê doza Kurdan.

L. R a m b o u t

Bi arîkarîya agahdarî û belgeyên ku Dr. Kamûran dide , ew di sala 1947 an de, di bin derewnavê Lucien RAMBOUT, pirtûka xwe ya pêşîn li ser Kurdan "Les Kurdes et Le Droit" (Kurd û Hiqûq) derdixe. Li ser dewrana navdu - şeran (yên cîhanî), di vê pirtûkê de zehf agahdarîyên heja hene û çapbûna wê jibo dannaskirina doza Kurdan li derva gavekî giran bû. Wergerandineke pirtûka Bois li Beyrûtê bi zmanê erebî derketî ye. Tirkîya wê jî bi wergerandina Kendal di sala 1972 an de li Elmanya Rojava di nav "Wesanên Ronahî" de, dûre jî di 1978 an de li Stembolê bi dest Komalê çap bûye.

Piştî vê pirtûkê, Thomas Bois li ser zman, folklor, ol, wêje (edebîyat), sosyolojî û dîroka Kurdan xebitîye, bendên wî di kovarên Rohelatnasî û wisa jî di ensîklopediyên navneteweyî de derketine. Ewî cara pêşî hin helbestên Cegerxwin wergerandî ye fransîzî.

Di sala 1965 an ew sentezeke xebat û lêgerînên xwe yên li ser Kurdan bi zman û uslûbeke sade, "jibo têgihîştina mirovê kuçê", di pirtûka xwe "Connaissance des Kurdes" (Nasîna Kurdan) pêk tîne. Ev pirtûk bi çapa fransîzî û îngilîzî li Beyrûtê derketî ye , 164 rûpel e, xeynî pirsên dîrokê qala pirsên jiyana rojê , ol, jinanîn, nexweşîn, bawerî, jiyana eşîrî û ya malbatî, wêje , hwd. . dike, gelê Kurd bi rûçikekî dilkêş û şêrîn pêşkeşî xwendevanên biyanî dike.

Thomas Bois, di 1966 an de vegerîya bû Parîsê û li wir çend salan fêrên "Şeh rezayîya Kurdistanê" dida. Li kuderê keysa qala Kurda kirinê peyda bûya ew li wir bû. Ew parêzkarekî dilkovanê doza rizgarîya gelê Kurd bû. Gelek rojnamevan û xwendekarên xîşim ku nû bi pirsê Kurdî bi lê dibûn arîkarîyêke dostanî û şîretên heja li cem wî didîtin. Dostê me yê birûmet roja 5 ê îlonê 1975 a di nexweşxanekî nêzikî Parîsê mir, bêy ku rizgarîya "Kurdistana xwe" bibîne. ■ ■

ÇARSALÎYA KOMELA

"Dostên Kurdan tune ne" tê gotin ji şkestina tevgera Kurdên Iraqê bi vir de di nav hin hawirên bedbîn de. Qenc bala xwe bidinê yên ku vê "rastîya xurt û ceribandî" belav dikin pirîcar ew in ku heta duh xwe spartibûn "dostanî" ya Şah û CIA. Kêngî evan "dostên" wan ên delal wan xapandin, li wan "bêbextî" kirin, wan jê derxist ku kes ji Kurdan re nabe dost.

Lêbelê dostên gelê Kurd hene; dostên berahî. Û ew zehf in jî li çar aliyên dinê. Tenê heta niha em li wan negerîyane, me xwe qenc bi wan neda ye naskirinê. Gelo çima hêzên demokratîk û sosyalîstên cîhanê ev çendî sal in arîkarîya tevgerên rizgarîxwazên gelê bindest dikin ji Vietnâmê heta Cezayîr û Mozambîkê, ewê li gelê Kurd jî nebin xweyî? Ku tevgera Kurd di destê serokatîyeke şoreşger an bi hindîkî demokratîk de be û nebê leyistoka kevneperestîyê û emperyalîzmê ewê çima arîkarîya wê ne kin?

Bi vê bawerîya xurt, hin milîtanên Kurd li Fransayê dest bi nasîn û dîtina kes û hêzên ku bi şerê xwe yê dijî kolonyalîzm û emperyalîzmê, bi piştgirîya şoreşên Cezayîr, Vietnâm û şerên rizgarîxwazên gelên din navdar bûne, kirin. Di hoya yên wan rojan de ku serokatîya barzanîvan bi tevkarîya xwe ya USA Sawak û Israel hetka Kurdan birî-

bû li ber ramana (efkara) demokratîka cîhanî, ev karê han hêsan (rehet) nîn bû. Piştî xebateke sal û nîv, di adara 1975 an de Komela Fransa-Kurdistan li Parîsê hatê danîn.

Hîmdarên komelê (binêre lîsta wan li jêr) hemî zane, filozof, nvîskarên binavûdeng, xelatên Nobelê û rojnamevanên eyan in. Gelek di wan endamên Dadîgeha Russelajibo mehkemekirina cirmên USA li Vietnâmê hatibû danîn in. Kesên wekî Jean-Paul Sartre, xelata Nobelê a edebîyatê, Simone de Beauvoir, Maxime Rodinson îndî bi pirtûkên xwe li Kurdistanê jî rind tînanaskirin. Li hawirên za-

nistî û siyasîyên cîhanî de kesê ku navê Prof. Laurent Schwartz, matematîkvan, Prof. Alfred Kastler, xelata Nobelê a fîzîkê, nebihîstibe tune ye.

Arîkarî û piştgirîya van dostên giranbiha pirsra Kurdî li ber çavên demokrat û pêşverûyan weke dozeke meşrû nîşan dide û jê re dibê temînateke qenc. Lê herwekî ew di hejmarê 2 a kovara xwe ya bi zmanê fransîzî "Solidarité Kurdistan" de dibêjin, ew tucar xwe nakin şûna Kurdan û iddia rênîşî û rehberîyê nakin. Riya rizgarîya xwe kifş kirin karê Kurdan bixwe ye; rizgarîya Kurdistanê tenê bi destên Kurdan dibe

bingehên xebatê

Bernama xebata Komelê li ser sê bingehan hatîye danîn: 1) arîkarîya gelê Kurd bikin ku ew qedera xwe bixwe kifş bike.

Navnîşana nû ya KFK:
Association France -
Kurdistan
BP 29
75221 Paris Cedex 05

2) rewşa gelê Kurd, ta de û zordestîyên ku lê tînanaskirin wisa jî şerê wî yê azadîyê li Fransayê bidin naskirin. 3) peywendîyên dostanîyê di nav gelên Fransa û Kurdistanê de saz kirin û xurt kirin. Ji vê bûnê çanda Kurdî li Fransayê bidin naski-

FRANSA-KURDISTAN

rinê, arîkarîya Kurdên ku li Fransayê dimînin bikin, çûneha ta fransizan a Kurdistanê hêsan bikin.

Jibo pêkanîna vê bernamê Komelê kengî hewcedarî peyda bûye kovar derxistîye, ji hêzên siyasî û hevde sazîyên (organîzasyonên) navnetewî re têlgraf û name şandî ye, mîtîng, civînên agahdarîyê an çandîyê pêk anîye, di rojname de bendan derxistîye. Komele wisa jî arîkarîya keç û xortên Kurdên ku li Fransayê ne kirîye, ji gelekên wan re îmkanên xwendinê bidest xistîye.

Lê, bêguman, saxê domdartirê vê xebatê derxistina pirtûkan e. Piştî ji nûve çapkirina afirandina

klasîk a kurdîzanê rûsî Basile Nikitine, "Les Kurdes", Komele komîteki xebatê danî ye jibo pêkanîna pirtûkekenûkuagahdarîyê ke siyasî û dîrokîye têkûz û zanistî li ser rewşa hemî perçeyên Kurdistanê pêşkêş ke. Ev pirtûk "Les Kurdes et le Kurdistan" (Kurd û Kurdistan) e; bi arîkarîya Prof. Maxime Rodinson û Gerard Chaliand, sekreterê giştî yê Fransa-Kurdistan, nvîskar û mîlîtanên antî-kolonyalîstê navdar, di gulana 1978 an de hatîye çapkirinê. Wergerandina wê ya elmanî di nêzik de, ya îngîlîzî-amerîkanî di dawîya 1979 an de derdikeve û ewê bi kurdî (soranî) û farisî jî li Îranê

çap bibe. Komele di vê navê de sêlikeke kurdî "Musique Populaire du Kurdistan" daye derxistin û pirtûka G. Chaliand a li ser helbesta xelkê "Poésie Populaire des Turcs et des Kurdes" ji nûve daye çapkirinê. Ew niha li ser çapa fransî ya "Mamé Alan" dixebite,

Bi saya vê xebatê wisa jî bi saya xebata mîlîtanên şoresgerên Kurd îro îndîhêz û partîyên pêşve rûyên mezin, wekî Partîya Komunîst, Partîya Sosyalîst, sendîkayên karkeran, komik û hêzên çep ên Fransayê hemî êşkere û bixurtî piştgirîya doza Kurdan dikin.

hîm d a r

P. Baudoin, evûqat, berpistyarê Federasyona Navneteweytîya Mafên Mirovtî; J. Bertolino, nvîskar, rojnamevan û fîlîmçêker; E. Braquet, fîlîmçêker û nvîskar; G. Chaliand, nvîskar; J. P. Cornet, rojnamevan; J. M. Domenach, nvîskar, gerîneyê kovara "ESPRIT"; E. Ducourau, rojnamevan; R. Dumont, nvîskar, hawirparêz (ekolojîst), namzetê serekkomartîyê di helbijartinên 1974 an de; D. Eudes, nvîskar û rojnamevan; R. Garaudy, fîlozof, nvîskar; H. Grall, nvîskar; M. Halbwachs, profesore sosyalojîyê; G. Halimi, evûqat, parêz kara doza jinan; G. Heraud, profesore hiqûqê, namzetê serekkomartîyê di helbijartinên 1969 an de, berpistyarê tevgera federalîsta ewrûpayî; A. Kastler, profesore, xelata Nobelê a Fîzîkê; R. Lafont, profesore û nvîskar; M. Leiris, etnolog û nvîskarê sur-

realîst; S. Manucci, rojnamevanê AFP; R. Marienstras, profesore; T. Mignon, evûqat, berpistyarê Federasyona Navneteweytî ya Mafên Mirovtî; J. Mincès, nvîskar; E. Morin, profesore sosyalojîyê; L. Panigel, profesore bîyolojîyê; Y. Person, nvîskar û profesore dîrokê; R. Pic, rojnamevan û fîlîmçêker; M. Rodinson, nvîskar, tîlamîzan, profesore dîrok û sosyalojîyê; C. Roy, nvîskar û rojnamevan; M. Royot, rojnamevan; J. P. Sartre, nvîskar, fîlozof, xelata Nobelê a Edebîyatê; M. Schaub, nvîskar; L. Schwartz, profesore, xelata Matematîkê; P. Thibault, rojnamevan, berpistyarê kovara ESPRIT; Vercors, nvîskar; P. Vidal-Naquet, profesore dîrokê; J. P. Viennot, mamosteyê dîrok û şerezayîya Kurdistanê; S. Vogel, etnolog û nvîskar; S. de Beauvoir, nvîskar û fîlozof.

KOYÎ

helbestvanekî welatparêzê mezin

Hacı Qadir Koyî li gundê Qoreqerac de herîmê Koyê sala 1815 ji dayka xwe bûye. Di piçûktiya xwe de bêbav maye; bavê wî miribû, dayika wî ew birîye Koyê û bi arîkariya axa û begên dewlemend û xêrxwaz daye ser xwendinê.

Ew li mizgefta Koyê de li cem mele Ahmet Gunbett tevî Mihemed Cell-zade hînê xwendine bûye û navê feqîttîyê stendiye û bi feqîttîyê gertyaye, çûye Xoşnavê, Serdestê, Erbilê, Kerkûkê, Sulemanîyê Sabilaxê û Şîno, li cem merivên zana û ulmdar hîn bûye, navê mele stendiye, bûye mele û bi navê mele li Kurdistanê gertyaye, çûye Stembolê, li wêderê bûye nasê giregirên Kurd û Kurdistanê, yên li wî wextî li ser qulixa hukmetê bûn û komên rewşenbirkirina Kurdan û serbestîya wan saz kiribûn. Li Stembolê Qadir Koyî bûye nasê şervanên azadkirina Kurdistanê, çend sala bûyê mamostayê kurên Bedîrxan Paşa. Li mala wîda ew dibe nasê nivîsara Ahmedê Xanî, destana wî "Mem û Zînê" dixûne û pêşgotîna wê bi wî gelek xweş tê, bîr û bawertîya wetenperwertî û milletperwertîya

Ahmedê Xanî li dil û aqilê wîda rûniştine. Ew dibê xemxurê milletê xwe, şêrên xwe derheqa halê milletê xwe, derheqa paşketina wîda nivîstine; di şêrên xwe de ew derdikeve meydana rewşenbirkirina millet, meydana şerê azadkirina millet ji bin destê şêx, pîr, axa û begên Kurd, ji bin destê hukimetên rom û Îranê nîşan dike, mîna Ahmedê Xanî li millet şîret dike, ku ber bi xwendinê herin, li şêrên azadkirina xwe de yekbin, rabert hev şer nekin, bi tifaq şer bikin bo xatirê azadkirina Kurd û Kurdistanê.

Qadir Koyî şêrên xwe bi soranî (kurdîya jêrîn) nivîstine. Ez çend şêrên wî bi herfên latîniya Celadet Bedîrxan, bi kurdîya jêrîn li jêrê dinivîsim, ku xortên me delal wan bixunin û bibin nasê bîr û bawertîya Qadir Koyî - şatrê Kurdayî navdar û peyrev û peyketîyê Ahmedê Xanî.

prof. dr. QANATÊ KURDO

Sermiyanê Beşa Kurdîya Instîtûta Rojhe-latnastîya Akademîya Zanistîyan a Yekîttîya Sovyetîyê.

her kurd e li nav hemû millet

her Kurd e li nav hemû millet
Bêbehr e ji xwendin û kitabet
Bîgane ji tercîma zmanî,
Esrarê kitêbê xelqê dizanî.
Yekser alim mezin û çûk,
Nexwendine qet du herfê kurdî.

estadê xetên ji van herseyan e,
Wek kund zmanê xwe nizane,
Bo çî kifr e bi zmanê xwe nûsîn?
Milletê bê kitêb û bê nûsîn,
Yeyrî Kurdan tune li rû zemîn.
Tu were hînî fen be, çî tê li wî ye,
Gawûr e, Hind e, yaxût Cihû ye.

Di vê esra dirîxda,
Sûrê min qelemtraş e,
Û kalanê min qelemdank e.

Hesinê sar bi fû nerm nabe,
Bi tirane hemam germ nabe;

Eger karekî nekin li vê navê bi zû,
Tuyê wextekî bibînî welat ji dest çû.

Merg û jin wek sîber û tav in,
Awa baqî bimînin, her bi tav in.

Çimkî çî li dara dinê ye,
Tê û diçe, hemû wek ba ye.

Sed şahaşa û padşa mirdin,
Seyr ke kurdê me her kurd in.

Her ji cafî heta bi goranî,

Hesreta min her ew e li dinê de,
Hacî wê bimre, nagîje dewra wan de.

Çî menşûr û gire-girê kurdî,
Çî bi nîzamî û kitêbê hurdî,

Saadî heyama xwe ma bû bēnanî,
Wek min bû gerok û bē xanî,

Nika xelk ji hesretê dimirin,
Beytên wî bi zêr û zîv dikirin.

Axirê rojekî jî wê bē û ehdî,
Xefetê bo min bixûnin wekî Saadî

Qazî, nesîr û muftîyên nîzam,
Wê rêbigihên ta medrese û alim

Bo nesiheyê zmanê kurdan e,
Sêrên min delîl û birhan e.

kezîzer

Kezî zerê kezî zer
Xulama memikên girover
Serî sor e binî zer
Mîna berfa newala
Sîha zinara li ser
Tu ji govendê were der
Te ramûsim car din her
Kezî zerê lewendî
Zerîyê were dîlanê
Gewrê were govendê
Sing doşek balîv zendê

Kezî zerê min sisê ne
Her sê delalîya dê ne
Yek min dudo xelkê ne
Min û bira devgirtî
Sê gul tê da bişkivî
Çibkim dosta dergistî
Esil dosta qîzî ne
Mîna şekir şêrîn e
Mîna gula bi bîn e
Mîna agir bi tîn e

Lo erdiko beyaro
Min lê çandî xiyaro
Çibkim dosta bi yaro

berhevkiyê:

ROGER LESCOT

NEWRÛZ


*Sersala Kurdan, cejna biharê
NEWRÛZ tsal bi dîlan û şahtyên
rengîn li gelek altyên Kurdîs-
tanê û li hin bajarên Ewrûpayê
hate pîroz kirin.*

*AZADÎ Newrûza xwendevanên
xwe pîroz dike û wekî diyartîya
sala nû helbesteke Ehmedê XANI
SEYRANA SERSAL Û GESTÊ pêşkêşî
wan dike.*

Dewra felekê ji bextî ferûz
Dîsan ko nîma ji nû ve Newroz
Mebînî li wê adetê mibarek
Şehrî û spehîyan carek
Bajar û kelat û xanî berdan
Teşbîh nijdiyan û cerdan
Sef sef dimeşîne kûh û deştan
Ref ref dixweşîne seyr û geştan
Hindek bi peyarî çûne baxan
Hindek bi siwarî çûne raxan
Hindek bi tebayî û bi kesret
Hindek bi hevalî û bi wehdet

Rabûne ve xanîm û xewatûn
Wan jî tejî gul kirin besatîn
Hûran kire meskenê xwe cen-net
Bê perde û bê melal û mîn-net
Dûşîze û duxter û rewalan
Pakîze izar û zilf û xalan
Sewdakerî eşq bûn di bazar
Hem bayiê hisn û hem xerîdar
Sersalî û bakîr û rewalan
Sedsalî ciwan û pîr û kalan

ehmedê xanî



KOMA STRAN Û

DÎLANA KURDA

Û serokê wê

Sala par ber dûrdîtinoka (tê levîzîona) komara Ermenîstanê, komeke stran û reqasa kurdî pêşda hat. Ev kom bi teklîfkirin çû bajarê Lenîngradê, tevî cejna Kurdayê Newrozê bû, ber xwendekar û mamostayên çend zanîngehên vî bajarî pêşda hat. Ev koma bi serokatiya sazbandê kurdî nav û deng Xelîlê EVDILE çendik-çend cara tevî olîmpîadaêd komarê bû. Ewê wan olîmpîadaêd jî ser ket û bi pesinnema pêşkeşêd mayîn hate rewakirinê.

Endamêd komê gişk breclêd gundekî ne. Ewana cilê kurdîyê awaz-awaz li xwe kirî bi qeşeng û çeleng stran û reqasêd kurdî nîşanî gelêd brayêd mayîn dikin.

Îsal rêdaksîya (nvîsekarîya) radîo kurdî gelek stranêd vê komê ser qeytanê nivîsîne û di belavkirinêd xwe de elan dikin, cîhan û alem dibihên. Serokê vê komê Xelîlê Evdile ye. Çend gotin derheqa wî da:

xelîlê evdile

Sala 1941ê bû, dema mala Evdile Abdile dengê tifalekî kurîn hat. Dê û bavê tîfal şikirbûna xwe anîn, wekî warê wan şîn bû û navê wî danîn Xelîl.

Hela Xelîl pêçekêda bû dema qezîyake giran hate ser neferê mala wan bavê wî - Evdile çû ser heqîya xwe û toqê sê zaroka kete stûyê dayika wî - Kawa Abas. Kawê xemla xweya bûkanîyê danî, cilê hiznê (şînê) li xwe kirin. Him der xebitî him jî malê. Neniherî wê yekê, wekî wan sala şer bû, welatda xelayî celayî bû, lê ewê zarêd xwe gulki mî xweyî kirin, fira xistin.

Çaxê Xelîl îdî mezin bû, çawa dibêjin xêr û şerêd cîhanê ji hev cihê dîkirin, diya wî rojeke gazî kur kir, derê qutiya xwe vekir, bilûrek jê derxist û got:

- Han lao, vê bilûrê hilde, ewa pêşkêşa bavê te ye. Gava ew kete ber mirinê, ewî ev bilûra da min, wekî tu mezin bûyî bidî me te. Bavê tê bilûrvanekî erhe de bû. Bira xwedê zêna kal û bava bide te.

Sal derbaz bûn. Xelîlê piçûk heval û hogirara diçû ber bexa. Ew qanix bû, tilî û pêçiyê vê meya, bilûr û zirnê jî diqefiland, gava ku guh dida lêxistina kûr, ew pêra firnax dibû, lê tu cara nêta wêra derbaz ne dibû, wekî ew here ber radîoyê lêxe û cîhan tev dengê zirna wî bibihê û pê zendegirtî bimîne.

Xelîl herro ber radîo kurdî rûdinişt, deng û awazê stranê kurdî serê wîda rûdinişt, jêra dibû xwîn û qinêt. Rojekî jî ewî riya nvîsekarîya radîo Erîvanêye Kurdî girt. Nvîsekarî wî ser çawa û ser sera qebûl kir. Ewî tevî dengbêja meya, fîqê û zirnê dixist. Ewî pir ser xwe dixebitî, diçû dewata, şaya dixemiland, mirazê bûk û zavê digîhande hev. Çawa dibêjin "ew bûbû gula govenda". Ewî gelek miqam bixwe sêwirand. Gelê Kurd îdî wî nas dikin çawa sazbandîzan. Gelek miqamêd wî çawa sêlik li Yekîtîya Sovyetî û li Fransayê da alîyê "Azadî" da derketine. Gelê Kurdê 20 milyonî bi ewledê xwe yê jêhatî va serbilind bû.

mamosteyê fîq û zirnê

Ewî pir miqamêd kurdî, ku dûr û cewahirêd gelê mene, ji windabûnê xelazkir. Xelîlê Evdî le çend miqam wisa jî ji radîo ya Îraqê û Îranê bihîstine û lêdixe. Niha wekî 70 miqamêd wî di fonda radîoyêda tene xweykirinê. Ewî gelek miqam danîne ser stranêd ku koma wî distire.

Koma stran û reqasa kurdî ku Xelîlê Evdîle serokatîyê lê dike, wê zûtireke li bajarê Moskova tevî cejna gelê Kurd "Newroz" bibe.

Em sazbandê zane, marîfet û jêhatî ra açixîyêd pir mezin dixwazin di dereca pêşveçûn û gulvedana sazbandîya kurdîya dewlemend da.

xelîlê çaçan

*Berpirsiyar û serekê
Radîoya Erîvanê ya Kurdî*

QUMRÎ

Qumrîkê ez gune me
Şivanê bavê te me
Aşiqê bejna te me
Evdalê çavê te me
Gorîya serê te me
De yar yar yar,
De yar yar yar
Bê te xewka min nayê

Qumrîkê ser bi zêr e
Delalê ser bi zêr e
Sîng dergehê bajêr e
Qumrîkê nadim mêr e
Delalê nadim mêr e
De yar yar yar,
De yar yar yar
Bê te sebra min nayê

Qumrîkê ez romî me
Nav bexçeya fendî me
Kumsorê efendî me
Heyran çavê reşbelek
Eşqê xortê cendî me
Heyran enîya bi deqendî
Eşqê lawikê kêfçî me
De yar yar yar,
De yar yar yar
Bê te xewka min nayê

Qumrîk sêva l'dikana
Kevoka serê dara
Xatûna li ser bana
Ketê mista nizana
Xera kirî bû dirana
De yar yar yar,
De yar yar yar
Bê te sebra min nayê

Qumrîkê b'zer helandî
Kurik keçik revandî
Serî li birê gerandî
Çavê neyara rijandî
Deşt û zozan gerandî
De yar yar yar,
De yar yar yar
Bê te xewka min nayê

berhevkiyê:

ROGER LESCOT

Xwendevanên delal,
Nvîsekarîya Azadî-
yê ji Kurdên li çar
alîyên dinê belavbû-
yî nameyan distîne.
Çapkirina hemîyan re
jmara rûpelên me
dest nade. Emê her ca
rê çendan di wan de-
rînin. Û ne tenê yên
ku pesindar in.

1° Hun zman haqas
paqij dikin, wekî hi-
ne gotinê we nayêne
femkirinê, wê gele-
kî pak be ku hun ser
zaranê cimaetê binvî
sînin.

NAMEYÊN

Erîvan

Rêdaksîya (nvîse-
karîya) me yê radîo-
êye xeberdanêd kurdî
ji şuxulê weyî kêrha
tî gelekî razî ye.

Em her tim bese -
bâr çavniherîya hej-
marêd kovara we ya
delal in, çimkî em ji
wê gelek tistî pê di
hêsin ser milletê
Kurd, ewledê weye kêr-
hatî da.

Kovara we ya mark
sîstîyêye tek tenê
ye ku li xerîcê zma-
nê kurdî tê çapkirinê.
We gelekî rast bi
jartîye riya kovara
xwe, cimaeta kurd tek
tenê bi riya marksîs-
tîyê, lenîniyê dikarê
bighîje mirazê xwe, a
zayê û serbestîyê.

Em gelekî şa ne,
wekî her hejmareke
kovara we de gilîgo-
tin ser Kurdên Sovê-
tîyê, pêşketina wan
da heye. Eva tiştêkî
lazim e, wekî birêd
meyê kurdê welatê de
reke jî pê bizanibin
ku gihîştine heqê
xwe, çawa pêşda çûne.
Niha çend şêwrê me
wera, herge lazim e
qebûlkin, herge ne la-
zim e, ew jî şuxulê
we ye.

2° Wê pak be, wekî
hun binvîsîn "Kovara
Kurdaye Marksîstî"ya
nê jî "Kovara Mark-
sîstîyêye Kurdîyê".

3° Pak dibe para
folklorîyê jî hebe.

Ez gilîyê xwe kuta
dikim, wera serbilin-
dayê û xweşîyê dixwa-
zim.

Bi silavêd şêrîn

XELÎLÊ ÇAÇAN MÛRADOV

Serek û Berpir-
sîyarê Radîo E-
rîvanê Kurdî

Innsburck (Awistiryê)

Welatparêzên delal,
brayên hêja û jêha-
tî...

Kovarên we ên we
ji Fransê ji min re
şandibûn hatin gihan
destê min. Pêşîya he-
mî tiştî, ez pîrozba-
rê we heval û hogi-
rên koçer im. Bi dil-
germî û serbilind we
gişan ji bona vê xe-
bata we a bêhempa û
giranbiha pîrpez di-
kim.

Ma gelo ji navê
"AZADÎ" xweştir ji
bona me Kurdan li rû
yê erdê çi heye?. Bî
rastî navê kovara we
an bi gotineka din
kovara me zehf rind
û xweş e. Paşê merov

tê de (di kovara me
de) tiştên zehf zehf
rind û kêrhatî dibî
ne. Bi kurtî ji "Ha-
war" pêve, hetanî ni-
ha di nav me xortên
Kurd de ji alîyê wê-
jeyî (edebî) de tiş-
tekî wisa hêja pêkne-
hatî ye.

Ji ber vê yekê, pî
roz pêwîst e.

Gotin ne hewce ye
ku hewcetîya me la-
wên Kurd hînbûna zma-
nê me ê zikmakî he-
ye. Ev jî bi kovara
we bi gengazî (bi re-
hetî) tê hîn bûn. Di
babetî (warê) zmanê me
de, gelek xwenda û za-
nayên me ên heta ni-
ha li welatên biyanî
dixwendin û bûne pis-
porên zmanan, zehf
hindik kar ji alîyê
wan hatîye kirin. An
bi gotineka din zman
nasên me ên Kurd, bî
tenê xwe bi zmanên
biyanî re mijûl kirî
ne. Lê çi mixabe ku
qet guhnedane zmanê
xwe ê zikmakî (bilî
Celadet û Kamûran Be-
dirxan). Ji ber vê yê-
kê ev karê ku wê
daye ser milê xwe ka-
rekî zehf pêşdatir û
divyayî (elzem) ye. Se-
rê min bi xebata wê
bilind bû.

Ji bona roznama
(teqwîma) we a delal
ez spas li ser xwe
deyn dihesibînim. Ta
niha min xelateka (di
yarîyeka) wisa ji tû
kesî hilnedaye. Zehf

pisporî û zana hati-
ye pêkanîn. Pîroz...

Dawî silavên xwe
ên bratî pêşkeşî we
hemû welatîyan di-
kim, serdarî û serfi-
razîya we daxwaza di
lê min e.

SIDDİK UNUS

Erîvan

Hevalên Delal

Min jimara kovara
Azadî ya sisîya wer-
girt. Çawa min reşbe-
leka berî vêda nivîsî
bû evê kovarê em gele
kî dilşa kirin, me vê
kovarê de gelek xwas-
tinê xwe dît.

Lê jiber ku em dix-
wazin ev kovar hê zor
be, hê baş be û pêşve
here min dixwast çend
fîkrê xwe jibo hersê
jimarê pêşîn bigota.

Gelekî baş e wekî
rûpelê kovarê pirsê
bizava Kurda yê nete-
wî-azadîxwazîyê têne
lênihêrandinê. Belê
zor pewist e wekî wan
pirsa bi Marksîstî a-
nalîz bikin, wekî dî-
rok me re bibe ders,
em jê hîn bibin. Gere-
kî çavê gundî û karke
rê Kurd, pêşmerge Kurd

Lê gelo bizava netewe
kî bindest dikare bi
temamî, giştî xeletî
be, paşverû be. Bizava
Kurdê Iraqê 14 sala
de her tişt nî bû, we-
kî bi destê CIA, Iranê
Israîlê û hêzêd cîha-
nê yên paşverû bû. We-
kî em tenê xeletî û
şaşîyê wê bizavê bê-
jin emê arîkarîyê bi-
dine dijminê wê, emê
Baasîsta re bêjin we-
kî we rast kir ew bi-
zava hincirand.

Loma jî tevî şaşîya
em gerekê dem û eta-
pê wê bizavê pêşverû
û baş jî bidinê kivşê.

Tosinê Reşîd

*Helbestvan û Rojna-
mevanê Kurd*

Rexne û xwe-rexne

Ji Xwendevanên Aza
dîyê re

Di hejmarên me
yên borî de hin şaşî,
kêmasî û xeletî çê-
bûn û xwendina hin
bendan dijwar kirin.
Ev di cîhkî de ji kê
masîya personel
û îmkanên me
yên tek-
nîk

xwe hînbûyî meriv ni
kare bend û pirtûka
binivîsîne, wergerîne.
Gelo tenê bi tirkîya
li kuçê hînbûyî kesî
ku zman û wêjeya tir
kî nexwendibe dikare
pirtûkên tirkî bi
serbestî jî hev der-
xe? Jibo ku herkes
têbigihê zmanekî ren
gîn û dewlemend ja
û belengaz kirin, rû-
çikandin nabe. Serê
çandî enîyeke sereke
ye di şerê rizgarî -
xwazê gelekî de.

Lê dîsa, heta ji
me tê em guh didêrin
rexne û şîretên heva
lan û dixwazin têda-
yî ya kovara xwe bi-
edilînin.

* Em neteweyekî
ji bîst mîlyonî bê-
tir in lê hê li ri-
yê erdê li ciyekî
çapxanekî me yî piçû
kî bi serê xwe

jî tune
ye

XWENDEVANAN

hê,
xeynî Aza-

dî'yê tu kovareka me
ya tenê bi kurdî nvî
sî dernakeve. Azadî
ji ber kêmasîya îmka
nan hê ji kemalê dūr
e. Em hêvîdar in ku
hunê li me negirin û
ku ewê her yek ji
xwe di tenga xwe de
xwe bide ber xebatê,
destê arîkarîyê, yê
hogirîya şoreşgerî
bide me. Her wekî Sey
dayê Xanî dibêje:

" Ev name eger xi-
rab e, ger qenc
Kesayê digel wê,
min du sed renc

Ev tifle eger ne
nazenîn e

Nûbar e bi min qe
wî şerîn e "

vekin, wan re bêjin kî
nin dost û dijminê
wan, wekî YNK û PDK î-
ro jî di destê kevne-
peresta, derebega û
bûrjûwazîyê de nin, we
kî gelek çara bîr û
bawerîya wana sîyasî,
lê xwastina nefsa wan
e tistê wanê girîng.

e.
Berebe-
re nvîskarî-
ya Azadîyê dinav
xebatê de bipije, xwe
bigihîne û her hej-
mar ji yên berê be-
dewtir û kêmxewlettir
be. Bi hindikî ev hê-
vîya me ye.

* Hin heval li
ser zman ji me gazi-
nan dikin, zmanê kova
rê giran dibînin. Lê
divê ku em têxin bî-
ra xwe hînbûn û bi-
karanîna her zmanekî
xebat û serêşan dix-
waze. Tenê bi zmanê
li malê ji dayika

ZMAN

Ferhengok

aborî: (t)ekonomi; (f)économie
 afirandin: (t)yaratmak; (f)créer
 alan: (t)yanki; (f)écho
 alîgir: (t)tarafdar; (f)partisan
 ango: (t)yanî; (f)c'est à dire
 arizî: (t)özel; (f)privé, particu
 lier
 aşîtî: (t)barış; (f)paix
 averû: (t)kavram; (f)conception
 azîn: (t)yöntem; (f)méthode
 bazirganî: (t)ticaret; (f)commer
 ce
 berxwedan: (t) direniş; (f)résis
 tance
 bihuşt: (t)cennet; (f)paradis
 bingeh: (t)ilke; (f)principe
 boran: (t)bunalım; (f)crise
 civak: (t)toplum; (f)société
 çap: (t)basım; (f)presse
 çapxane: (t)matbaa; (f)imprime
 rie
 çîn: (t)sınıf; (f)classe
 dane: (t)veri; (f)donnée
 danûstan: (f)mübadele; (f)échan
 ge
 daxuyanî: (t)manifesto; (f)mani
 feste
 dema me: (t)milad; (f)notre ère
 derewnav: (t)takma ad; (f)pseudo
 nyme
 dewsoke: (t)yedek; (f)accessoire
 dijaneyî: (t)tersine; (f)contra
 rement
 dirav: (t)para; (f) argent, mon
 naie
 dirûvdayî: (t)benzer; (f)analo
 gue, similaire
 divîyahî: (t)zorunluluk, gereksi
 nim; (f)nécessité
 dîrok: (t)tarîh; (f)histoire
 dojehe: (t)cehennem; (f)enfer
 ebûr: (f)geçim; (f)subsistance
 ebûr kirin: (t)geçinmek; (f)sub
 sister
 enî: (t)cephe; (f)front
 frotişk: (t)eşya; (f)marchandise
 gef: (t)tehdit; (f)menace
 gefandin: (t)tehdit etmek; (f)me
 nacer

gerdûn: (t)evren; (f)univers
 geremol: (f)kargaşalık; (f)dèsor
 dre, confusion
 girse: (t)kitle; (f)masse
 girseyî: (t)kitlesel; (f)massif
 hemberî: (t)rekabet; (f)concur
 rence
 herikan: (t)akim; (f)courant
 hêsan: (t)kolay; (f)facile
 hêsandin: (t)kolaylaştirmek; (f)
 favoriser, faciliter
 hilberinî: (t)üretim; (f) produc
 tion
 hişandin: (t)muhakeme etmek; (f)
 raisonner



hoy: (t)koşul; (f)condition
 hoyandin: (t)şartlandırmak; (f)
 conditionner
 hwd. (her wekî din): (t)vs.; (f)
 etc.
 jêza: (t)köken; (f)origine
 jîndar: (t)canlı; (f)vivant
 karîn: (t)iktidar; (f)pouvoir
 kevneşopî: (t)geleneksel; (f)tra
 ditionnel
 kirû: (t)olgu; (f)fait
 kovar: (t)dergi; (f)revue
 mengî: (t)ideal; (f)idéel
 mengîwer: (t)idealist; (f)idéa
 liste
 mirovhiz: (t)insancıl; (f)huma
 niste
 mînak: (t)örnek; (f)exemple
 name: (t)mektup; (f)lettre
 navneteweyî: (t)uluslararası ;
 (f)international

nûçegihan: (t) muhabir; (f) corres
pondant (de presse)
netewe: (t) ulus, millet; (f) na-
tion
neteweyî: (t) ulusal, milli; (f) na-
tional
neteweperest: (t) milliyetçi; (f)
nationaliste
nîşe: (t) not; (f) note
nîştiman: (t) vatan; (f) patrie
nûçe: (t) haber; (f) nouvelle
ol: (t) din; (f) religion
nûjen: (t) modern; (f) moderne
nvîsar: (t) yazı; (f) écrit, texte
nvîskar: (t) yazar; (f) écrivain
paderserî: (t) padersaht; (f) pat-
riarcat
perav: (t) kıyı; (f) rive, bord
pewendî: (t) ilişki; (f) relation
rapport
peyweng: (t) alet, gereç; (f) ins-
trument
pêlgerîn: (t) dalgalanma; (f) fluc-
tuation
pêşajo: (t) öncü; (f) avant-garde
pêvajo: (t) süreç; (f) processus
pirtûk: (t) kitap; (f) livre

raman: (t) düşünce, (f) pensée
ramandin: (t) düşünmek; (f) penser
rexne: (t) eleştirî; (f) critique
rizgarî: (t) kurtuluş; (f) libéra-
tion
rizgar kirin: (t) kurtarmak; (f)
libérer
rojnamevan: (t) gazeteci; (f) jour-
naliste
sermiyan: (t) başkan; (f) président
serok: (t) şef; (f) chef
tevger: (t) hareket; (f) mouvement
têgihîştin: (t) anlam; (f) sens, ac-
ception
tixûb: (t) sınır; (f) frontière
xwendegeh: (t) okul; (f) école
xwendegeha pêşîn: (t) ilkokul ;
(f) école primaire
xwendegeha navîn: (t) orta okul;
(f) école secondaire
xwendekar: (t) öğrenci; (f) étudi-
ant, e
xwendevan: (t) okuyucu; (f) lec-
teur, trice
xwe-rexne: (t) özeleştiri;
(f) auto-critique
xweserî: (t) özerklik; (f) autono-
mie



**Elfabê

Ji salên 1930 an bivirde zmanê Kurdî bi tîpên (herfên) latînî tê nvîsandin. Elfabeya latînî xweş li zmanê me tê û ewê bêguman bibe ya hemî Kurdan. Lê niha jiber sedemên cihê reng piraniya Kurdên Îran û Iraqê tîpên erebî, yên Sovyetîstanê jî tîpên rûsî bikartînin. Jibo agahdariya xwendevanan va ne ev her sê elfabe.

Latîni	Rûst	Erebî	Latîni	Rûst	Erebî
A	А	ا، آ، إ، ع	N	Н	ن
B	Б	ب	O	О	و
C	В	в	P	П	پ
Ç	С	с	Q	Қ	ق
D	Д	د	R	Р	ر
E	Е	ه، هـ، ع	S	С	س، هـ، ع، ك
Ê	Э	هـ، هـ، ع	T	Т	ت
F	Ф	ف	Ü	У	ط
G	Г	گ	U	У	و
H	Н	ح	Ü	У	و
I	И	هـ، هـ، ع	V	В	ف
Î	И	هـ، هـ، ع	W	В	و
J	Ж	ج	X	Х	خ
K	К	ک	Y	У	هـ، ع
L	Л	ل	Z	З	و، هـ، ع، ك
M	М	م			

KURDÎ BIXWÎNE, HÎN BIBE, HÎN BIKE!..

* Ji derketina hejmara 5 a bi vir de çapa biyanî de gelek bend derketin xasme li ser bûyerên Kurdistana Îranê (şerên Sanandac û Naxadê), kêmasiya cî hê me ji tenê binavkirina van rojnameyan re jî dest nade. Emê di vî warî de dikaribin çend agahdarîyên kurt û serreke bidin.

* **TF1**, bernama yeka ya TELEVÎZYONA FRANSAYÊ şeva 4 ê gulan di 21:30 de fîlma hevalê me Jean Bertolino li ser "Hişyarbûna Kurdan li Îranê" û roja yekşem 8 ê gulanê di 13:15 de roportaja wî ya li ser şerpezeyî û bindestîya Kurdan li Iraqê nîşan da. Bi mîlyonan kes li van fîlman temaşe kirin; balyozxana Iraqê nameyekî protestoyê şand ji berpîrsîyarê televîzyonê re: li rejîma wan a pêşverû (!) re nebû hatine kirin!...

* **EUROPE1**, yek ji mestirîn radyoyên fransizî roja 1 ê gulanê di 13:20 an de bi Jean Bertolino û hevalekî Kurd re li ser qewimandinên Kurdistana Îranê mullaqat kir.

* **RADIO - KANADA** roja 28.4.1979 an, saet 18 an de bernamekî 15 deqîqe li ser rewşa giştî ya Kurdan weşand; mîlîtanekî Kurd bersiva pîrsên rojnamevanan kanadî da, ji gelên Kanadayî re salixê zordestîya ku li 20 milyon Kurdan tê kirin da.

* **CIVÎNA ÇAPÊ** ya Komela Fransa - Kurdistan li merkeza Federasyona Navneteweyî ya Mafên Mirovî li ser rewşa Kurdan li Iran, Tirkîye û Iraqê. Rojnamevanên fransizî û emerîkanî (New York Times), ajansên nûçeyî (AFP û Reuter) û yên televîzyonê (VISNEWS) agahdarîyên di vî civînê de dayî li welatên din belav kirin.

* Kovarên fransizî Le Nouvel Observateur (12.3.1979), France-Nouvel le (19.3.1979)-organa Partîya Komunîsta Fransayê-, l'Histoire (çile 1979), Le Point (2.4.1979) li ser pirtûka "Les Kurdes et le Kurdistan" bend nûvîsîn. Di kovara jinevan Histoire d'États (hejmar 12) roportajekî li ser jînanên Kurdistana Îranê, di rojname sosyalîst "Le Matin" (13.5.1979) roportajekî li ser şerê Kurdên Iraqê di kovara troçkîst Lutte Ouvrière (24.3.1979) bendekî dirêj li ser Kurd û hindikahîyên neteweyî yên Îranê, derket.

Çapa Kurdî

Bi zmanê Kurdî û tîpên latînî bilî Azadîyê tu kovar dernakevin. Va ne navên yên ku bi tîpên din der-tên.

★ Riya Teze, ji sala 1930 a bivirde li Erîvanê di heftê de dû car derdikeve. 4 rûpel û Organa PK a Ermenîstanê ye.

★ Kurdistan, organa PDK a Îranê ji mehê carekî bi tîpên erebî dertê. 4 r. (çapa fari-sî jî dertê)

★ Bîra Nû, organa Partîya Komunîsta Iraqê, bi tîpên erebî dertê.

Kovarên ku bi du zmanan dertên

★ Ji serê salê bi-vir de hikûmeta tirk derxistina hemî kovarên çep û pêşverû wîsa jî yên ku bi tirkî-kurdî derdiketin (Devrimci Demokratik Gençlik Dergisi, Özgürlük Yolu, Rizgarî, Roja Welat) qedexe kirîye û ew kovar niha dernayên.

★ Lê derketina Azadî'yê ji hevalên Kurdên Ewrûpayê re rêvekir û niha rojbi-roj hejmara kovarên tirkî-kurdî zêde dibê. Em ewan hemîyan pîroz dikin û ji wan re jiyaneke domdar dixwazin, bi rêza elfabeyî, navên kovarên ku li Ewrûpayê dertên va ne:

★ Armanc, Dengê Komkar, Pale, Roja Nû, Stêrka Sor.

* Stran û Leylan * *

AZADÎ, jibo qene nasîna mûzîkiya kurdî sêlik (plak) û ka setên biqalîte bidest dixê, dadigre û difroşe. Ji niha ve hun dikarin vên li jêrê binay kirî ji me bixwazin. Her kasetekê 60 deqîqe dom dike û bi 5 Dollar (10 DM), Sêlika 33 ger bi 7 Dollar (14 DM) e.



azadî

AR AM



Stran û Leylanên
KURDÎ
Kurdish Songs & Melodies

K a s e t

1. Meqamên kevn bi orkestra nûjen ((lêdixê Orkestra Celerîya Kurdistanê)
2. Kulamên Dilan-1
3. Kulamên Dilan-2
4. Kulamên Siyaran
5. Bilûr, Fîq (dûdûk), Pîyano
6. Def, Zirne û Fîq
7. Beyt, Qesîde, Helbest
8. Aram
9. Kulamên Kurmancî û Soranî (bê musîkî)
10. Kulamên Govendê (bê musîkî)
11. Di nêzik da dertên Lawçeyên Mahabadê-1
12. Lawçeyên Mahabadê-2



dezigirtiya xortan

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

... ..

ÇILE 1979 JANUARY

daxeyan		qarxeyan		qarxeyan		di		gerrê		yekserran	
1979	1978	1979	1978	1979	1978	1979	1978	1979	1978	1979	1978
1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
13	14	15	16	17	18	19	20	21	22	23	24
25	26	27	28	29	30	31	1	2	3	4	5



azadî

KURDISTAN



area : 228 000 km²
 population : 20 000 000

last colony
 FREEDOM FOR THE KURDISH PEOPLE!
 Xarîta Kurdistanê, 40x60, 3DM.

Roznama A Z A D Î 1979
 13 Rûpel, 30x40, 10dm.

* Stran û Leylan * *

YAR SOSIN

CEMÎLA CELÎL

Allegro



Yar so - sin, so - sin, so - sin, so - si - nê mêr - gê - da ma - yî.



Ke - ç'ik çû - ne dî - la - nê, h'e - mû k'em - be - rê ba - da - yî.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Keç'ik çûne dîlanê, h'emû k'emberê badayî.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî.
Em çûne ramûsana, aqil û sewda nemayî.

Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrgêda mayî,
Yar sosin, sosin, sosin, sosinê mêrga hêşîna.

Lenîn dibêje

{ ÇAWA MIROVAHÎ NIKARE BIGIHÊ WINDABÛNA SINIFAN(ÇÎNAN) BÊY
GEHÎNEKA DERBASÎ YA DÎKTATORIYA SINIFA BINDEST, WISA JÎ EW
NIKARE BIGIHÊ TEVHEVÎYA NAYEREVÎNA(MIQEDERA) NETEWÉYAN TA
KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARIYA TEMAMÎ YA HEMÎ NETEWÉYÊN
BINDEST NEJÎ, TA KU NETEWÉYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA ÇIHÊ-
BÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN, }

Oeuvres (Afirandin), 22, p.159



azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ

Jibo nêzîkbûyîna hêz, bêşok û ko-
mikên şoresger û welatparêzên Kurdîs-
tanê dixebite.

Bi arîkariya komekî Xebatkar û Xwenda-
karên Kurd derdikeve. Bi tu partî û
hevdesaziyên tu perçeyekî Kurdîstanê ve
negirêdayî ye.

Berpirsiyarê gîstî : K E N D A L
Nûisekarî : E V D O
Berpirsiyarê malhebûnê: H. KARACA
Foto-Maket : J. BERDLIND
Çap : Îsmet-Misto-Raûf

NAVNÎŞAN (adres): K O V A R A A Z A D Î
B.P.378 75625 PARIS CEDEX 13 France

●DIRAV(pere)li ser navnîşana A Z A D Î
CCP n° 23 37 449 L Parîs/ France

KURDISTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST!